


Başûrî, bi nas-

nameya tirkmenan derbasî Tirkiyeyê dibin.

Nasnameyên tirkmenan li Başûr bi sed dolarî difiroşin wan, da ku tirkmenên ku hejmara wan encax 250 hezar li Başûr heye, di nav belgeyên fermî de sê milyon bidin nîşan. Lê ji van sê milyonan du milyon û hefsed û pêncî hezar kurd in.



Dixwazin

Kurdistanê bikin

Tirkmenîstan

Hevpeyvîn li gel Veysi Varlı:

Divê muzîka kurdî li ser koka xwe şîn bibe

R. 8-9

Lêkolîn:

Derheqê Batmanê de çend agahdarî


R. 4-5

Azad Şîrîn:

Şoreşger Mahmûd û dayika Asya

R. 6

Azadiya **WELAT**



SAMI TAN

Çareseriyeye ku her kesî dilxweş bike, dema welatê kurdan azad be, kurd jî nabin penaber, ango bi awayê ku ewrûpî dibêjin, li serê kesî nabin "bela"

Dewleta tirk kevir li gûzeka xwe xist

Dema mirov bala xwe dide bûyerên ku vê hefteya dawîn qewimîne, tê dîtîn ku bi giranî bûyera penaberên kurd di rojevê de cih girtine. Li ser vê bûyerê kêşeya kurd kete rojeva cihanê û nivîsên berfireh li ser kurdan di çapemeniya cihanê de hatin weşandin. Rayedarên tirk, dîtîn çalakîyên valakirina Kurdistanê berevajî daxwazên wan encamê didin, îcar dest pê kirin, gotin "PKK li pişt vî karî heye". Lê ev gotin ku wekî daxuyaniya Tansu Çillerê ya bi rengê, "Helikopterên PKK'ê gundan vala dikin", dûtî aqilan e û dibe mijare pêkeniyên. Her wiha ev daxuyanî bêçaretîya dewleta tirk jî nîşan didin, lewre wan digot, PKK hatiye radeya ji hev belavbûnê, lê niha dibêjin, ew dikare bi sedan mirovan li keştiyan siwar bike û bibe Îtalyayê.

Dema mirov nûçeyên çapemeniya tirk û çapemeniya cihanê dide ber hev, rola çapemeniya tirk di xapandina gelê tirk de jî bi awayekî diyar derdikeve holê. Çapemeniya cihanê dibêje, ev kar bi destê

mafaya tirk pêk tê, çapemeniya tirk dibêje, "PKK vî karî dike", rayedarên dewletên ewrûpî dibêjin, "Heta kêşeya kurd çareser nebe, rê li ber pêla penaberan nayê girtin", çapemeniya tirk dibêje, "Ewrûpî tene xapa PKK'ê". Serokwezîrê Îtalyayê dibêje: "Mafên kurdan ên sivil hene", Serokwezîrê tirk dibêje, "Li gorî Lozanê mafê kurdan tune". Dinya dibêje, li dora 4 hezarî gundên kurdan hatine valakirin, li başûrê Kurdistanê ambargoyeke duhêlî û pest û kotekî heye, çapemeniya tirk dibêje, "PKK'ya ku li hemberî artêşa me têk diçe, kadroyên xwe dikîşîne Ewrûpayê".

Hinek ewrûpî rastiyê dibînin, ne ku derdê wan kurd in, Îtalya di meha kewçêra sala çûyî de beşdarî nav dewletên Schengenê bûye û di meha adarê de jî wê mirovên li Îtalyayê bêyî kontrol karibin derbasî welatên ewrûpî bibin. Tê gotin ku sala çûyî çar hezar kurdên başûrî xwe gihandine Fransayê, ji meha tîmeha vir de sê hezar penaberî xwe gihandiye Îtalyayê û heke hinek bergirî neyên girtin, bi hezaran kes di rê de ne. Dewletên din ên

ewrûpî Îtalya û Yewnanistanê sûcdar dikin, lê ew dewlet jî dibînin ku ew kar bi destê dewleta tirk tê meşandin. Her wiha gihîştine vê baweriyê ku heta kêşeya kurd çareser nabe, pêla penaber danakeve. Dewleta tirk li aliyekî nasnameyên tirkmenan dide kurdên başûrî û bi hezaran dolar ji wan distîne wan digihîne welatekî ewrûpayê (hinek ji wan tîn xeniqandin), li aliyê din dema qala çareserîya kêşeya kurd tê kirin, agir ji devê rayedarên tirk dibare. Welatên ewrûpî li aliyekî naxwazîyên penaberên kurd werin welatên wan, li aliyê din jî her alî ve piştevaniya dewleta tirk dikin, pî nadin ser dewleta tirk ji bo ku kêşeya kurdî çareser bibe. Gundiyên ku gundên wan bi panzerên alman, tîn wêrankirin, xwe li Almanya digirin.

Çareseriyeye ku her kesî dilxweş bike, heye û ew jî jî aliyê berpîrsîyên tevgera azadiyê ve tê bilêvkirin: "Dema welatê kurdan azad be, kurd jî nabin penaber, ango bi awayê ku ewrûpî dibêjin, li serê kesî nabin "bela"

Komcivîna Neteweyî helwesteke dîrokî ye

Ferhengok

- | | |
|---|--|
| amûr: enstrûman | mengî: îdeal |
| ast: sewiye | mebest: armanç |
| bidyad: esas, temel | mêjû: dîrok, tarîx |
| bikêr: îşe yaramk | mîrnîşîn: |
| bêpeyan: bêhempa | nakokî: dijberî (çelişki) |
| çavkanî: jêderk | navgîn: hacet |
| çewsandin: perçiqandin | nemaze: nexasim |
| çêlêkirin: qalêkirin | nîmandin: nîşandayîn |
| çêj: tam, ekt | paşverû: kevneperest |
| çolter: çol (kîr) | paşav: tirs, xov |
| darejtîn: nivîsandin (biwêjî) | pejrandin: qebûlkirin |
| dahatû: hatin (gelir) | pejmrûde: perîşan |
| dahûrandin: analîzkirin | pergal: sîstem, (dûzen) |
| dêmanî: bicîhbûyî (yerleşik) | peywir: görev |
| dîrûv: rû û rûçik | pêşverû: terakîperwer (ilerici) |
| erjeng: muthîş | rave: şîrove |
| erk: wezîfe (görev) | rêbaz: metod (yöntem) |
| erg: celebeke cihûkê | rêntin: nêrin |
| eyar: çerm, post | rêz û rûçik: qural û qayide |
| êrdim: herêm | rûdan: qewimîn |
| gengaz: 1. pekan, mumkûn 2. hêsan | selmandin: peyitandin |
| geşedan: bipêşketin, geşbûn | şarîstanî: medeniyet |
| hîkari: bandor | şewe: awa |
| hîm: xîm | teçe: şekil |
| jenandin: lêxistin (ji bo amûrên muzîkê) | teqez: hîç, qet |
| kariyer: bi fonksiyon | tekûz: mukemmel |
| kendal: kaş (dik yamaç) | tîmfel: kinc, qiyafet |
| keftî: gemî | ting: çop |
| kasayî: teqlid | vatinî: wezîfe, kar |
| mayînde: kalıcı | vedeng: tunduya deng |
| | vekolîn: lêkolîn (araştırma) |
| | xweza: xweris, tebîet |

R. AHMED HESEN-MUZAFER AZAK

Dem, pêvajoya çiqas dibore û merc tene guhartin, pîrsgirêk, lêgerîn, helwest û nîqaş jî pêwîst e li gorî zimanê demê were bikaranîn. Zimanê demê tu car tiştên ku li paşmayî û bêhelwestiyê napejirîne.

Şerê rizgariya Kurdistanê gelek rûpelên dîrokê bi paş ve zivirandin. Meşa azadiyê di gelek qonaxan re derbas bû û di roja me ya îroyîn de gihîştîye qonaxêke bilind. Yanî çawa ku tê gotin: "Vejin tamam bû, dora rizgariyê ye." Pêwîst e li gorî vê pêvajoya ku em tê de ne, hinek gavên ji zimanê rizgariyê werin avêtin.

Beriya her tiştî, pîrsgirêkên gel û berhemên şoreşê, êdî damezirandina vîneke neteweyî xistiye rojevê. Tiştê herî bi qudret û girîng ew e ku, di roja îro de, çareseriyeye Kurdistanê derdikeve holê.

Îro gelê kurd, gavên mezin diavêjin û bi yekîtiyê dijwar ji dîroka xayîn û serdestan hesab dipirse. Ji bo vê yekê, amadekariya komcivîna (kongre) neteweyî xwediyê wateyêke dîrokî û îroyîn e. Ji ber ku gelê kurd, ji hezar salan vir de, cara yekemîn e ku gavên wiha xurt û bi rûmet, bi hêza xwe pêk tîne. Jixwe "dîrok zanabûn û helwesta dema pêşîya me ye." Bi vê rastiyê wateya vê xebata komcivîna neteweyî kûr û fi-

reh e. Bê guman ev jî, ji bo welatekî serbixwe û azad ne tiştêkî biçûk û hêsan e.

Beriya her tiştî, vîn û saziya serokatîyeye neteweyî derdikeve holê. Ev yek jî, di beşdariya hemû hêzên Kurdistanê yê welatparêz re derbas dibe. Navê vê saziyê jî komcivîna neteweyî ye; komcivîna neteweyî, bîngeha rêxistina dewleteke neteweyî û hilweşandina rêxistinên kevneperest e. Lewre di dîroka Kur-

Pêwîst e ev merc bi berpîrsî were nîrxandin. Lewre ev pêvajoya pêvajoyeke girîng e. Barê welat û gel ketiye ser milê hemû sazî, rêxistin, komele, karker, hunermend û rewşenbîrên gelê kurd.

distanê de heyanî beriya Têvgera Azadiyê çiqas serhildan û raperîn hatine çêkirin jî, ji ber berjewendiyên kesane pîr hindik daxwazên neteweyî kirine rojeva cihanê. Her dem pêlên serhildanan li dîwarê tixûbê herêma ketine. Ji bo vê yekê, neyaran toq kiribû sitîyê kurdan û digot: "Kurd nikarin xwe birêve bibin." Komcivîna neteweyî jî bo vê yekê jî bersiveke girîng û bi rûmet e.

Êdî mêtînger jî wekî berê nikarin destên xwe yê bi qirêj bixin nava gelê kurd û bi destên sîxurên xwe nakokîyan di nava kurdan de çêbi-

kin û kurdan bi vî rengî ji hev biqetînin.

Êdî tu kes nikare bibêje. "Hêja merc negihîştîye, amadekarî tune ye." Her tişt amade ye. tenê xîreteke bi berpîrsiyarî pêwîst e.

Merc û şertên komcivîneke neteweyî di vê demê de, ji her car pirtir çêbûye. Di serî de gelê kurd jî vî yekê re amade ye. Ji konevanî, leşkerî, dîplomatîk bigire heya rêxistinî û bîrdozî, gelê kurd bi rengekî xurt xwe amade kiriye.

Her wiha nakokiyên ku di navbera mêtîngeran de, pirtir bûne û li ser pîrsgirêka Kurdistanê wekî berê nikarin bi hogirî bi hev re peymanî çêkin û tîkiliyên xwe bikin yek.

Daxwaz û hesreta gelê kurd jî ew e ku, rojekê pêş de yekîtiyê were çêkirin û hikmê xîyanetê ji holê ra-

be. Lewre sedemên, hemû tiştan jî, çênekirina yekîtiya hêzên kurd e. Ew gelên ku di navbera wan de yekîtiyê tunebe, her dem ji provaqasyon û êrişên neyaran re vekirî ne. Xîyanet jî, ji vî rewşê cesaretê digire.

Bi kinahî; roj roja vatîniyên neteweyî ye û roj roja seferberiyê û zindîkirina dilnêna paqîjîyê ye. Ev jî gihîştina mengiya (îdeal) gerdûnî bi xwe re tîne. Li hemberî propaganda dijmin ku dibêjin 'me gerîla marjînal kiriye' komcivîna neteweyî bersiveke dîrokî ye û serkeftina "sala finalê ye."

Dixwazin Kurdistanê bikin Tirkmenîstan

Başûrî bi nasnameya tirkmenan derbasî Tirkîyeyê dibin. Nasnameyên tirkmenan li Başûr bi sed dolarî difroşin wan, da ku tirkmenên ku hejmara wan ancax 250 hezar li Başûr heye, di nav belgeyên fermî de sê milyon bidin nîşan. Lê ji wî sê milyonî du milyon û hefsed û pêncî hezar kurd in.

Di sinor de sed dolar ji wan tê standin. Belkî jî hê zêdetir. Bazirganên mirovan ev kar ji xwe re kirine pîşe. Nasnameyên tirkmenan didin van kurdên Başûr. Bi nasnameya tirkmenan derbas bûn, ji derbasbûna bi nasnameya Iraqî hêsanîr e. Dema ku kurdên başûrî tene Tirkîyeyê ji aliyê mafyaya tirk ve tene pêşwazîkirin. Ew yek bi yek li malên ku hatine kirêkirin tene bicihkirin. Piştî ku bi kaçaxçiyên re tatkiliyan dafînin, li gorî cihê ku wê herinê, buhayê wê tê standin.

Ji bo Yewnanîstanê jî 2-3 hezarî heta 4 hezar dolarî didin. Hinek kaçaxçî hene ku piştî ku pereyan ji kurdên koçber distînin, ji holê winda dibin. Kesên ku pereyên wî bi vî awayî tene dizîn, careke din vedigerînin Başûr. Li gorî agahiyên ku başûriyan dane me, di nav vî yekê de bi giştî MÎT'a Tirkîyeyê heye. Tacîrên mirovan jî di bin destê MÎT'a tirk de kar dikin.

Li gorî daxuyaniyên başûriyan, jiyân ji bo wan zor dijwar e. Li Tirkîyeyê ew nikarin wekî her mirovî tevbigerin. Qûtên xwarinê, heger buhayê wê 50 hezar be, ji wan sed hezar tê standin. Porsiyonek xwarin heger bi 350 hezarî be, ew ji bo wan bi milyonê ye. Ew nikarin wekî her kesî bi rehetî derkevin derve û bigerin. Ji tîrsa polîsan rojên xwe di navbera çar dîwarên malê de derbas dikin.

Nasnameya tirkmenan bi 100 dolarî dikirin

Penaberên kurd ji Başûr ji ber şer reviyane û hatine Tirkîyeyê. Li gorî agahiyên ku me ji başûriyên li Stenbolê dijîn bi dest xist, ew ji Başûr bi nasnameya tirkmenan derbasî Tirkîyeyê dibin. Nasnameyên tirkmenan li Başûr bi sed dolarî difroşin wan, da ku tirkmenên ku hejmara wan ancax 250 hezar li Başûr heye, di nav belgeyên fermî de sê milyon bidin nîşan. Lê ji wan sê milyon du milyon û hefsed û pêncî hezar kurd in. Wan jî bo ku bi rihetî derbasî Tirkîyeyê bibin nasnameyên tirkmenan kirîne. Rastî ew e ku ev nasname ji layê dewleta tirk ve hatine dayîn.

Başûriyekî bi navê B.S.O der barê rewşa jiyana xwe û penaberên kurd de hin agahî dane me. B.S.O. di destpêka axaftina xwe de wiha dibêje: "Min heft salan pêşmergetî kir, ez birîndar jî ketim. Êsta (vêga) jî ji lingê xwe birîndar im. Lê piştî van egeran jî bo min pêşmergetî xelas bû. Dawiya vî şerî nîn e. Min di nav YNK'ê de şer kir."

Her wiha B.S.O. bi xwe di nav YNK'ê de assubay bûye. Ew diyar dike ku gelek subayên YNK û PDK'ê jî bo ku li dijî şer derketine, ji başûrê Kurdistanê reviyane. Penaberê kurd B.S.O. rewa xwe ji Başûr wiha tîne zimên: "Bi riya Barzanî hatina Stenbolê zor-hêsan e. Lê bi riya Talabanî

hatin gelekî dijwar e. Dema ku ez hatim, li sicila min nihêrtin, heger nasnameya min ne sexte bûya, ez nedigihîştim vir. Lewre YNK'yî bûm. Lê ji bo aligirê Barzanî çûyîn û hatin gelekî hêsan e. Ez di ser Îranê re hatim. Pêşî em derbasî Wanê bûn. Ji ber ku ez bi riya kaçaxiyê, ango bi riya Talabanî hatim, min tu pere nedane kesî. Piştî Wanê ez derbasî Stenbolê bûm. Lê li vî derê jî em xwe ji her tiştî vedişêrin. Li vî derê jî tu jiyân nîn e, ev rezîlî ye, bindestî zor zehmet e.



Li aliyê din pismamê B.S.O. tevî jîna xwe û sê zarokên xwe di keştiya ku par di meha gelawêjê de noqî binê avê bû de, xeniqîne. Ji wan 42 kesên ku xeniqîne çar kes jî malbata pismamê B.S.O. bûne. Dîsa di heman keştiyê de malbata Osman Xweşnav ku di nav emniyeta KDP'ê de ajan bûye xeniqîne. Osman Xweşnav berpîrsê istixbarata KDP'ê ye. Her wiha B.S.O. dadixuyîna ku wekî Osman Xweşnav bi dehan kesên berpîrs ji Başûr malbatên xwe direvînin. Piştî ku malbatên xwe derbasî Ewrûpayê dikin, ew jî li wir nasekinin.

Tirkîye dikare di 24 saetan de Başûr vala bike

Li gorî daxuyaniya penaberê kurd B.S.O. heke Tirkîye bixwaze, dikare di navbera 24 saetan de Kurdistanê Iraqê vala bike. Jixwe armanca dewleta tirk ew e ku Kurdistanê vala bike. Kurdên wê derê jî ji ber zilmê li cihê ku bikaribin gezek nan dest bixin, digêrin. Her wiha B.S.O. diyar dike ku li Zaxoyê navenda tirkmenan heye yanî qereqola ku pasaporta tirkmeniyê li wê tê çêkirin. Ji wê qereqolê bi 600 dolarî kurdan dişînin Stenbolê. B.S.O. jî dide zanîn ku ew qereqol di bin destê MÎT'a Tirkîyeyê de ye. Bi vî mebestê hejmara tirke-

man zêde dibe û ya kurdan jî kême dibe.

B.S.O. diyar dike ku, dema ew ji Stenbolê hetanî Edirneyê diçin carina nêzikî 600-700 dolarî ji wan distînin. Lê % 80'yên ku diçin tene girtin. Di dawiya axaftina me de jî B.S.O. got: "Min biryara xwe daye, ezê vegerim welêt."

Dîsa li gorî daxuyaniyên penaberên kurd, bi giştî yên ku navbertiya vî karî dikin kurd in. Ev kurdên ku vî karî jî dikin heta êvarê bi polîsan re radibin û rûdînin, bi giştî îranî û iraqî tevî mafyaya tirk dibin. Di

sexte ye, pere ji wan dixwazin. Eger pere tunebin, wan bi şûn de dişînin Başûr. Dîsa A.M.E.A dadixuyîna ku, iraqiyên ku zengîn in di navbera du rojan de bilêten xwe yê balafirê amade dikin û bi riya vî mafyayê diçin. Yên ku pereyên wan tunene du salan li vî derê di aşxaneyan (loqante) de didin xebitandin, erebeyan bi wan didin paqijkirin.

Di encama wê de pereyên ku berhev kirine ji bo heqê riya xwe didin kaçaxçiyên. Penaberê kurd A.M.E.A diyar dike ku, di navbera van mafya û subayan de tatkilî heye. Ev subayên tirk jî serê ferdekî sed dolarî distînin û paşê wan derbasî Yewnanîstanê dikin. Yanî tu kême li ber wan nayên danîn.

Her wiha penaberê kurd A.M.E.A dide zanîn ku penaberên kurd ên ku di keştiya dawî de ya li Îtalyayê derket bi giştî jî Stenbolê bi rê ketine. Dîsa diyar dike ku ew kes hemû jî ber şer reviyane, kar û emel li Iraqê sekiniye. Pêşmergetî heye, pêşmergetî jî di vî yan tu aliyê Talabanî bî, yan jî yê Berzanî.

Bi fermana PDK'ê nêçira kurdan

Ji aliyê din ve penaberekî din bi navê G.S dadixuyîna ku kurdên ji nav PDK'ê reviyane Tirkîyeyê ji aliyê istixbarata tirk ve tene girtin. PDK listeya kesên ku reviyane derdixê û dide Tirkîyeyê. Dewleta tirk jî li gorî vî listeyê derdixê nêçira kurdan. Kurdên ku dixê binçav di demeke kurt de dide destê PDK'ê. Dîsa G.S dide zanîn ku cîhazên modern yê Tirkîyeyê li başûrê Kurdistanê hatine bicihkirin. Her wiha G.S bûyereke ku di serê wî re derbas bûye ji me re vedibêje; Berî niha bi çend rojan polîs pasaporta wî dipirsîn. Pasaporta wî tuneye û wî digirin. Di bin çav de 50 dolarî jê dixwazin. Dibêjin: "Heger ku tu nedî, em dê te bişînin şubeya biyanan" Ew jî 50 dolarî dide û tê berdand. Dîsa li gorî gotina wî, kurdên ku li şubeya biyanan dicivînin 50 dolar jî wan tê standin û şubeya biyanan jî her roj kême pêncî kesî nahewîne.

Her wiha esnafekî Sêrtî bi navê Reşîd ku dikana wî li Fatîha Stenbolê ye diyar dike ku, rojekê polîsekî penaberek li dikana wî zêft kiriye û li ber çavên wî deh hezar mark jê xwestiye û gotiye: "Heger tu nedî emê te jî holê rakin!" Penaberê kurd jî hezar mark daye wan û bi wî awayî jî nav destê wan xelas bûye. Dîsa Reşîd xeber daye bernamaya Uğur Dündar a bi navê "Arena", lê mixabin tu kes bi ser wan de nehatiye.

Der heqê Batmanê de çend agahdarî

Di şerê qirêj de 3500 gund hatine valakirin û şewitandin, bêguman gundên Batmanê jî nesibê xwe ji vê yekê standine. Bi îhtîmaleke mezin hinek ji wan gundên ku me li jêrê navê wan da, niha jî holê rabûne. Lê ji ber tengbûna wext me nikaribû xebateke dûr dirêj bide ber xwe, xwe bigihîne çavkaniyên agahiyên û vê mijarê zelal bikin. Heke der barê vê yekê de xwendevanên me karibin me agahdar bikin, emê kêfxweş bikin.

Cînarên Batmanê

Bajarê Batmanê (Êlihê) li navîna bakura Kurdistanê ye. Li başûrê Batmanê Mêrdînê; li rojhilata wê bajarê Sêrtê, li rojhilata bakur Bilîs, li bakur Mûş û li rojava jî bajarê Amedê heye.

Aqara bajêjê Batmanê: Aqara bajêr 4694 km² ye. Bilindahiya bajêr di navbera 500 û hezar metroyî di ser asta bahrê re ye. Bilindahiya navçeyan jî wiha ye; Navendê; 543, Kercewsê; 700, Hezo; 720, Qubîn; 896, Eskif 500 û Sason jî 1000 metro di ser asta bahrê re ye.

Çiyayên bajêr:

Çiyayên di nav sînorên Batmanê de ne berdevama çiyayên Zagrosan ango Torosên rojhilata bakur in. Hinek çiyayên mezin ên di nav sînorê Batmanê de ev in; li navçeya Sasonê Çiyayê Meleto (2967 m.) Çiyayê Golatê (1473M.), li navçeya Hezo Çiyayê Avçî (2121 m.), Çiyayê Selaşê (1944 m.) Çiyayê Meydanoktepe (2042 m.) li dorhêla navenda Batmanê Çiyayê Remanê (1339) ku petrol (neft) li wê derê tê derxistin û li Heskifê jî Çiyayê Yamayê (1263 m.) ye.

Di nav sînorên bajêr de deşt kêrn in. Dešta herî mezin di navbera navçeya Qubîn (Beşîrî) û Êlihê de, bi navê "Dešta Batmanê" ye ku ji 210 km² yan pêk tê. Deşt ji bo çandin û hilberîna zêde bi ber û bi adan e (Bi bereket e).

Çemên bajêr:

Çemên ku ji nav sînorên Batmanê dizên û ên di nav sînorê Batmanê re derbas dibin ev in:


Çemê Batmanê: Dirêjahiya çem 86 km û 75 metro ye. Çem li bakur di minîteqeya Sarimê de dest pê dike û ber bi başûr ve bi Çemê Pasûrê (Qulp) ve di-be yek.

Çemê Serkenê: Jê re Çemê Zorî jî tê gotin. Dirêjbûna çem nêzikê 62 km. ye: Çemê Serkenê jî beşek ji çemê Batmanê ye.

Çemê Sasonê: Çemê Sasonê ji Çemê Serkenê dirêjtir e. Êv çem jî milekî Çemê Batmanê ye. Ji bakura Pira Çetaqê ber bi 3 km. 'yî ve digihêje Çemê Batmanê û di-be yek.

Çemê Xerzan: Dirêjbûna çem 160 km. ye û 120 km. 'yê wê jî di nav sînorên Batmanê de ye.

Çemê Dicle: 530 km. dirêjbûna çem e. Ji 530 km. yan 78 km. di nav sînorên



Batmanê de diherike.

Nifûs

Nifûsa Batmanê li gorî hejmartina sala 1990'î bi giştî 344.669 bû. Ji vê hejmarê, 193.621 kes li bajarê, 151.042 kes jî di gundan de jiyana xwe didomandin. Li gorî îstatîstîkên sala 1997'an nifûsa Batmanê her çiqas ne li gorî mercên adîlane û asayî hatibe eşkere kirin jî nêzikê 400.000 derketiye, lê li gorî çavkaniyên herêmî ev hejmar jî 600.000'î boriye.

Gundên navendê:

Telmis- Akça
Korîkê- Aydınkonak
Girêşîra- Balpınar
Bileyder- Binatlı
Kêrike- Biçakçı
Bida- Çayüstü

Reşîkê- Çarıklı
Mozgêlanê- Demirlipınar
Mêrina- Doluca
Tilmercê- Demiryolu
Meymûniyê- Demirbilek
Ermiye- Erköklü
Zaxora- Kesmeköprü
Kirêdiya- Kösetarla
Cigerto- Kuyubaşı
Başorik- Kayabağı
Koxikanu- Karagün
Teyarê- Güvercin
Bêdiyan- Oymataş
Receba- Reçepiler
Şikefta- Suçeken
Ziwalika- Yakıtlı
Gundê Kêkikê- Yeşiköz
Gurgurê- Yeniköy
Dawûdiyê- Yolağzı
Halkamî- Yediyoğ
Licikaxasik- Bayraklı

Girberesik- İkiztepe
Çinêrê- Yoluveren

Gundên Heskifê (Hasankeyf):

Alîn- Akalın
Xizo- Aksu
Seyarê- Aydınca
Kuheyiniyê- Bayırlı
Girkêbir- Büyükdere
Gundêqulê- Çardaklı
İzdarê- Dereli
Keferalp- İrmak
Kêwexilê- Kavacık
Darhêfê- İncirli
Reşê- Karaköy
Mêrdîsê- Kumluca
Keprefê- Taşlı
Mêbiyê- Öğütlü
Xirbekür- Palamut
Bizinko- Keçeli
Lêpina- Saklı
Kaniya Mezin- Soğucak
Gundêdiyarê- Tepebaşı
Wezrinê- Uzundere
Difnê- Üçyol
Xirbasimâl- Kavak
Xanikan- Yakaköy
Botikan- Yemişli
Kêdilê- Yolüstü
Sebilê- Çatalsu

Gundên Kercewsê (Gercüş):

Kelaha Kercewsê- Akburç
Merwanî- Akyar
Kefrê- Arıca
Kamarîn- Aydınlı
Herdêfê- Başarköy
Xulukan- Başova
Bêxasê- Boğazköy
Heştwanê- Çalışkan
Şûkeyrê- Çiçekli
Binkên- Şüküryurt
Bilekçê- Deriçi
Hawrê- Düzmeşe
Tafo- Erişte
Êsê- Gökçepınar
Dêrdilê- Gönüllü
Bîrbêtê- Görbüz
Kermutê- Karalan
Xirbmercê- Ardıc
Bêdarê- Güzelöz
Berlatê- Kayalar
Narqetin- Kesiksu
Qirqatê- Kırkat
Kerkinê- Koçak
Cumeylinfê- Kozlu
Batirgiz- Kutlu
Derkûfan- Nurlu
İlozê- Özler
Berdaholê- Poyraz
Pîparê- Sargın
Baglêt- Rüzgarlı
Xerabêbena- Seki
Mercê- Serinköy
Zelî- Ulaş
Bêcirman- Vergili
Hirmêsê- Yakıtlı
Êrdê- Yamanlar
Êrmûnê- Yassıca
Dêridib- Yolağzı
Balanê- Yüceköy

Eynkafê-Kayapınar
Acîbê-Ardıçlı
Mudelfîbê-Bağlıcı
Qesrê-Doruk
Ximedî-Geçit
Melemlîha-Gökçe
Hêsarê-Hisar
Qentarê-Kantar
Zivingê-Kışlak
Bokolin-Koyunlu
Sûleybin-Kömürçü
Babinîr-Sabanbik
Xaldaxê-Sarıkaya
Basyatê-Taşçı
Hoska-Tepecik
Gundikê-Yayladüzü
Nunîpê-Yenice
Xiro-Bağözü

Gundên Hezo(Kozluk):

Harbak-Armutlu
Norşên-Alıçlı
Baştirîna Jêr- A. Kıratlı
Dêrçûçê- Akçakışla
Petêxiyê-Arıkaya
Hergemo-Bölükkonak
Gola-Beşkonak
Herbelûs-Beybağı
Eynromî-Çaygeçit
Reşêderan-Çayönü
Baqirnaz-Danagözü
Dêrê-Dere
Apikan-Duygulu
Kûrerê-Derince
Malegirê-Gündüzlü
Gohê-Geçitalı
Mîrêrik-Gürpınar
Sîcanê-Güllüce
Bizêziyê-Günyayla
Timoqê-Gümüşörgü
Balo-İnişli
Papurê-Kayadibi
Comikan-Kumulpınar

Qedirê-Karaoğlak
Salîbê-Karpuzlu
Dehlikê-Kaletepe
Şêderkê-Kamışlı
Mêlkîşan-Kavakdibi
Qeynterê-Konaklı
Dêrşîwan-Karşiyaka
Newelan-Duludere
Kanîkê-Samanyolu
Dirşahê-Ünsaldı
Mîlikan-Uzunçayır
Şelmo-Ulaşlı
Orteçay-Ortaçay
Bamequşa-Uzunyazı
Cêldekan-Ortaca
Şikeftan-Oyuktaş
Eynrasê-Tosunpınar
Holê-Taşlıdere
Melefan-Tuzlagözü
Xuskûtê-Parmakkapı
Bêhikê-Yapaklı
Kevrêrezan-Yıldızlı
Kenîkê-Yayalar
Xafikê-Yankılı
Mişrîtan-Yedibölük
Bînek-Yazılı
Siphîyê-Örensu
Sûcê-Eskice
Mangik-Geyikli
Baştirîna Jêr- Y. Kıratlı
Zîlan-Yeniçağlar
Rebatê-Yanıkaya
Şapê-Yendidoğan
Narkiyê-Yağmurlu
Pelkê-Yapraklı
Ceznê-Yazpınar
Eynhisarê-Pınarhisar

Gundên Sasonê (Qebilcewz):

Herent-Acar
Şêxikan-Aydımlık
Xerîbê-Balbaşlı
Sînorê-Binekli

Xelîsê-Çağlı
Şîrtînek-Dağçatı
Kanîsor-Dereköyü
Kahkik-Derince
Qawistêk-Dikbayır
Cemala-Dörtbölük
Şêxan-Erdemli
Tarûk-Geçitli
Kêganê-Gönlüce
Xaçîreng-Gürgenli
Tanzê-Heybeli
Bozikan-Kaleyolu
Sêbanê-Karameşe
Cidornî-Kaşayla
Kelhesna-Kelhasan
Aritên-Meşeli
Awirdos-Sarıkyayla
Wirşengê-Örengül
Badîrmud-Taşyuva
Xelîlan-Yığıtler
Gundênu- Tekevler
Taraşê-Umurlu
Kîderê-Yolüstü
Cacasê-Yücebağ
Belave-Kilimli
Cacût- Kayadüzü
Heşîrê-Koçkaya

Gundên Qubîne (Beşiri):

Dêrahemzo-Alaca
Hopê-Asnadere
Bêzbutê-Abağı
Dêrakira-Ayrancı
Barîncê-Bahçeli
Sulanê-Başarı
Erenzê-Bespınar
Helfasê-Beyçayırı
Bolîndê-Bilek
Binarê-Çakıllı
Hêlewîyê-Çavuşbayırı
Barîslê-Çevrimova
Alafê-Dayılar
Azîkê-Değirmenüstü

Xendûkê-Deveboynu
Hethetkê-Doğankavak
Baciriyê-Doğanpazarı
Newalê-Eskihamur
Barîslê-Güvercinlik
Licikê-Güneşli
Zercelê-Danalı
Germikê-İlica
Dusedekê-Işıkveren
Xîznameîr-İnpınar
Sulanê-İkiyaka
Awiska Jor-Karaduman
Awiska Jêr-İlköprü
Xîndukê-Kaşüstü
Sarîbê-Kayatepe
Kelokê-Kuşçukuru
Silaxar-Kumçay
Hemdûna-Kurukavak
Bêziwana-Kumgeçit
Girêçêlo-Kumru
Şîmîzê-Oğuz
Mêrgêreçal-Otluca
Bêharzik-Örmegöze
Têxeriyê-Uğrak
Qorixê-Uğurca
Feqîran-Uçkuyular
Dirbêsê-Yaylıca
Sewdiqê-Yalınca
Bahems-Yalınkavak
Hicrê-Yolkonak
Kevêrzo-Yenipınar
Kaniqûlê-Esence
Mêzareş-Yakacık
Memikan-Yazıhan
Kurtikê-Yeniyol
Derdewîne-Yeşiloba
Cinesker-Yontukyaza

AMADEKAR: SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Têbînî: Di hejmarê me 98'an rûpel 4 de nivîsa bi navê "Mîrov bi xwezîyê nagihê kezîyê" ji ber ku navê nivîskar nedihat xwendin, bînav derketibû, lê paşê nivîskarê nivîsê Ferec Çobanoğlu em pê hesandin ku nivîs a wî ye. Em vê kêmasîyê rast dikin.

Kurd û rojnameya bi kurdî Azadiya Welat

AHMET BARAÇKILIÇ



Hejmarê rojnameya Azadiya Welat gihîşt sedî. Di van sed hejmarên ku hatine weşandin de, gelek analîz, nêrîn, raman, nûçe, agahdarî, çîrok û metelok ji bo xwendevanên zimanê kurdî hatin weşandin. Bi nîrxên giranbuha û bi kedek bêhepa hatin derxistin. Berî her tiştî, ez bi dilgeşî vê xebatê pîroz dikim, rêz û hurmetên xwe ji berpirs û xebatkarên vê rojnameyê re pêşkêş dikim û xwendevanên wê ji silav dikim û serkeftinê dixwazim.

Tê zanîn ku di dîroka me de yekemîn car e ku rojnameyek xwerû bi kurdî û bi hejmarek wisa zêde hatiye weşandin. Ev rojname (Azadiya Welat) ji berhem û nîrxên neteweyî berhemeke bi nîrx û dîrokî ye. Xudanên van berheman bi nîrxên diravî û bi mêzînan nayên pîvan. Ew şehîdên pakrewan, ew lehengên li serê çiyayan, bi milyonan keda gundî û karkeran, bê çar û nêçaran û her wiha Têkoşîna Rizgariya Neteweya kurd ligel meş û poşa xwe sazî û çapemeniya xwe

ji dadimezirîne, diweşîne û di jiyane de vedijîne.

Ev serkeftina neteweya gelê me ji me re pîrozbahiyek herî girîng û bi rûmet e. Ji bo me girîngiya duyemîn jî, ew e ku em bişopînin, xwedî li van berheman derkevin, biparêzin û pêwîstiya wan bi zanistî bi kar bînin. 'Her teyrek bi refên xwe re difire' Her gel bi zemanê xwe diaxive. Mîrov bi hîsên xwe, xeyalên xwe dijîn, vedijîn, bi pêş dikevin, ger gel rastiyê bi zanistiyê re têbîkoşe li dijberî her dijwariyê dikare xwe biparêze, jiyana xwe berdeham bike. Divê mirov bibe xwedî fêrîz û huner, ger hebe hunera te, ger tu bi ruh û vîna xwe bijî, bê guman tu yê jiyana xwe bikarîbî berdeham bikî. Fêhmdarî û zanistî têrê nake, divê tu van tiştan di jiyane de bi kar bînî, ger te bi kar neanî her tişt bê mane û bê encam e.

Di bawerî û di axaftinê de her dilsozekî doza gelê kurd girîngiya rojnameyê û pêwîstiya bipêşxistina zimanê kurdî bê dijberî dipejirîne, lê mixabin di jiyana xwe de li gorî pêwîstiyên vê yekê tevnagere. Ger em bi rastî û di karwanîyê de bi gelê xwe re ne, divê em di jiyana xwe ya rojane de vê yekê nîşan bidin, zarokên xwe bi zimanê kurdî perwerde bikin, ger di pratîkê de wisa nebe, mixabin bawerî jî nabe.

Di vê nivîsê de mebesta me pîrozkirina Azadiya Welat û weşandina sed hejmarên wê ye. Ma gelo me girîngiya rojnameyê nîrxandîye? Bersiva wê daye? Alîkarî û

hevkarî nîşan daye? Ango em xwedî lê dereketine?

Mixabin bersiva van pirsan ne erênî ye. Neyarên raman û zimanê me bêrawestan êrîşî ser rojnameyê dikin û ji rojnameyê re bi her awayî asteng dixwazin ku kurd bi zimanê xwe fêr nebin û rojnameya wan neyê weşandin û negihêje xwendevanan. Daxwaza neyar diyar e û pêwîst nake ku mirov dirêj dirêj şîrove bike. Lê li beramberî van êrîş û astengan, mixabin me li gorî daxwazan alîkarî nekiriye. Di van sed hejmarên ku hatine weşandin de, nivîsên herî zêde li ser vê mijarê, girîngiya zîmanê, fêrbûn û fêrkirina zîmanê, taybetiya rojnameyê hatine nivîsandin. Ez naxwazim dubare bikim, lê her dem di mêjiyê min de zîndî ye, ez nabêjim dilê min dibêje.

Divê em li zîmanê xwe vegerin, bi xwe re bidin jiyandin, zarokên Kurdistan ên nîfşa bê ji çîrok, metelok, awaz û helbestên kurdî bê par nehêlin, bi wan mezin bikin, bi wan bidin jiyandin. Di vir de zêde dijwarî nîn e, ger mirov daxwaz bike zaf hêsan e. Daxwaza rojnameyê jî ev e, ev daxwazê gelek pîroz û giranbuha ye, hilgirtina ser çavan, hilgavtînek dîrokî û pêşkêşîna neteweyî ye. Divê bibe parçeyek ji jiyane. Gotina destpêk û dawiyê jî ev e: Divê Azadiya Welat bijî û hîn bi sed hezaran bê weşandin û bigihêje sed hezaran.


Ev jî bi xwendina me, belavkirin û danasîna me pêk tê û bi ser dikeve.

Şoreşger Mahmûd û dayika Asya

Di berxwedana rizgariya neteweyî de keda fu mirovî winda nabe. Xwediyê vê dozê, tim û tim diyar dikin ku şehîdên me rûmeta me ne. Di vê zilma reş de xortên me li dijî dijmin çavên xwe negirtine, serê xwe netewandine, li dijî top û tanqên dijmin û firokeyên dijmin agirê rizgariyê li çiya û deşt û zozanên Kurdistanê vêxistine. Ala Rizgariyê li serê Agirî, Cûdî, Herekol, Mûnzûr çikandine. Sond û peymanan wan: "An serkeftin an mirin..."

Di vê berxwedanê de, Mahmûd Oğuz (Quto) jî şoreşgerê xweser bû. Mahmûd di sala 1956'an de li gundê Nisêbinê yê li ser navçeya Kercewsê ji dayika xwe dibe. Li gundê wan şerek çêdibe, mirovek tê kuştin. Li ser vê yekê bavê wî tê girtin, li Hepsa Mêrdînê wî radizînin, ji bo Mahmûd û dayika wî, demeke bi zehmet dest pê dike. Dayika Eysê ji bo ku jiyana zarokên xwe bidomîne, wekî mîrekî dest diavêje kar û dişixule; ji Mêrdînê ji Nisêbinê çît, çarîk, maruk û çaya qaçax tîne difroşe, zarokên xwe hewceyî tu kesî nake. Mahmûd jî dibistana seretayî dixwîne, bi wê zarokatiya xwe ji bo zivistanê diçe çolê karîkê êzingan tîne malê, ji aliyekî din ve jî xwe dide kêleka dayika xwe, li gundan, li civatan pê re digere. Lê çiqas diçe çerxa felekê ji wan re xerab digere. Bavê Mahmûd di Girtîgeha Mêrdînê de ji dest û lingên xwe felc dibe. Pir dom nake û ew diçe ser dilovaniya xwê. Dayika Eysê radiibe mala xwe ji gund tîne Êlihê. Mahmûd jî dibistana Seretayî xelas dike, ji xwe re li derdorê dixebite. Mahmûd li taxa Karşiyaka dijî, lê Mahmûd hingî bîrbir bû û zarokiteyêke bi feqîriye derbas kiribû, bejna wî gewdeyê wî bilind nebûbû. Lê cîgerê wî wekî pola mezin bû, di demeke kurt de tevî koma şoreşgeran bûbû, ji van koman a ku têkoşîneke dijwar dida, gel digot 'Apocî'ne, Mahmûd jî Apocî bû. Di nav koma hevalan de jê re 'Quto' dihat gotin. Li dijî axa û paşverûyan jî zû de, çeka xwe teqandibûn. Carinan jî ji wan re digotin siwarî, ji ber ku li dijî hêza dijmin hazir bûn. Mahmûd jî şoreşgerê bû ku bi rihê Apocîtiyê dijiya. Mahmûd şervanekî jêhatî bû, temenê wî di eniya leşkerî de derbas bû, mîlîtanekî baş çek dişixuland, mîrxas û çeleng bû.

Dema ku şoreşgerê mezin Kemal Pir girtine, partî xeber distîne ku wê Kemal Pir di ser Êlihê re bibin Sêrtê. Partî biryarê distîne ku di rê de wî ji



Mahmut Oğuz

destê dijmin xelas bikin. 12 heval çalakdar in di rê de, ketine kemînê li benda hatina konvoya leşkerî ne, lê xeber ji partiyê re tê, vê biryarê diguherin. Mahmûd digot: "Wê kêliyê texsiyêke me tenê hebû, em diwanzdeh heval lê siwar bûn, wekî terman me xwe avêtibû ser dilê hev."

12'yê rezberê cuntaya faşîst karê xwe dijwar didomîne, Mahmûd jî li taxa 19 Mayisê xebat girtiye ser xwe; têkoşîna xwe didomîne. Leşker bi serê sibê re diavêjin ser taxa 19 Mayisê mala ku Mahmûd tê de ye. Ji bo ku tade li malê nebe, razî nabe, dibêje ezê derkevim. Mahmûd dertê, li sikakê dizivire, leşker û polis diqîrin, dibêjin: "Bisekine, teslîm bibe!" Mahmûd baz dide, lê dijmin wî gulebaran dike, Mahmûd xwe li ser diavêje erdê. Dijmin dibêje qey me ew kuşt. Dîsan jî newêrin rasterast herin ser, hêdî hêdî nêzî dibin, wî digrin. Piştî îşkenceyên Êlihê, Sêrtê, Amedê ew jî tevî hevalê girtîgehê dibe, li

cem Mazluman, Xeyriyan, Kemal, Eliyan, di hemû berxwedanan de cih digire. Bi îdamê tê cezekirin, piştî heşt salan ew tê berdan. Di van demê dirêj de dayika Asya jî li derveyî hepsê tim bîr û baweriya wî di dilê xwe de dipejirîne. Mahmûd, di qawişa 36'an de, jiyana girtîgehê domandibû. Mahmûd berî ku bibe şoreşger zewicibû. Lê zarokên wî tunebûn. Hevala wî Emîne jî bi sêdaqetêke mezin hevaltiya xwe meşand.

Rojekê Hevalê Mahmûd li kolanan digere, polîsek dertê pêşiya wî, wî disekinîne, dibêje nasnameya xwe derxe. Mahmûd jî dibêje: "Ez ji Êlihê me, polis dibêje 'Ax ulan ku ji Êlihê ez Quto zeb bikim.'" Mahmûd dibêje: "Tê çî bikî?", dibêje: "Ezê wî hûr hûr bikim, ezê wî bixwim, Mahmûd kulma xwe bi şid û hêrs li devê singa xwe dixê, dibêje: "Ez im quto ulan!" Destê xwe jî diavêje newqa xwe. Yê polis kezepqetandî dibe, bi çargavî baz dide û li pişt xwe nanêre.

Piştî 8 salan ku Mahmûd di Girtîgeha Amedê de dimîne û dertê, dixwaze tevî şervanan bibe, li gorî gotinan, heval dibêjin "tu xebatên xwe li bajêr bidomîne." Digotin Mahmûd pir caran jî bi serê xwe çalakî dikirin, heta, carekê jî li taxê, ew û hizbî-kontra şer dikin, heval pê re diçin ku notirvaniya mala wan bikin, ew dixeyide dibê herin bila tu kes nemîne, ez dikarim xwe biparêzim.

Piştî qere çarşemê, li Êlihê şerê taybet û qirêj, bi hemû şideta xwe dest pê kiribû, her roj kuştin dibû, jiyana mirovan ji ya mirîşkan erzantir bûbû. Mahmûd jî dixwaze derkeve derveyî welêt. Diçe Stenbolê û vedigere ku pîreka xwe jî bi xwe re bibe. Dijmin rojekê kemînê li ber datîne, ji kolana tê malê, di rê de polisê sivil sê caran wî seh dikin, dinêrin bê sileh e, di noqteya çaran de wî dikujin. Welatparêzên ku dibihîzin tev dimeşîne nexweşxaneyê. Nexweşxane jî tijî tîmên taybet in. Lê dayika Asya êrişî wan dike, carina jî dilîlîne, dibêje: "Xortên kurdan tev Mahmûd in. Tev lawê min in". Piştî Şhadeta Mahmûd jî dayika Asya tim li saziyên demokratîk, li partî û sendîkayan e.

Ew wekî ciwanekê bi hêz e, dilê wê bi aşî û azadiyê re ye. Dayika Asya karê xwe bi xwe dike. Rojekê got: "Ezê herim postexaneyê", min got: "Ez alî te bikim", nêzî 15 name dan destên min. Min birin, min nihêrî ku ji Mehmet Can Yüce, Sabri Ok, Sadrettin Aydınlik, Bedrettin Kavak, Muzafer Ayata û gelek kesên ku navê wan nayê bîra min re hatine şandin. Ji wê rojê û vir de, ez dibêjim, dayika şoreşgeran Asya. Dayika Asya jî pir zilm û zar kişand û hê jî dikişîne. Dayika Asya di civînan de, di pêşandan û hemû serhildanan de cih girtiye. Tu car netirsiya û hêviya xwe ji şoreşgeran qut nekir. Alîkarî û hezkirina xwe ji wan qut nekir.


Hê dema ku Mahmûd girtî ye, ji gundê Kerboranê îtfirafkarek bi navê Evdile, dayika Asya jî dide girtin. Radibin dayika Asya dibine Mêrdînê, di bin çav de 5 rojan îşkenceyê lê dikin, lê ew tu agahiyê nade dijmin. Radibin ji Mêrdînê, wê tînin Sêrtê, 12 rojan, îşkence û zehmetiyan li wir ji dikişîne, pişt re wê berdidin.

Piştî ku ev dayika 70 salî bi van bîr û baweriyên germ bijî, ez bawer im di demeke kin de wê hêviya me şin bibe.

10 rêbendan 1994:

Erdal Gedik (Cihat) şehid ket

Erdal Gedik di 1962'yan de li gundê Parxanoka Çewilkê ye tê dinyayê. Dibistana seretayî Ji Depê (Karakoçanê) kuta dike. Dibistana navîn û lîseyî jî li Çewilkê diqedîne. Di 1981'ê de tê girtin. Nêzikî 30 rojan di girtigehe leşkerî de dimîne. Di 1985'an de tevî refên gerîla dibe. Di 1991'ê de diçe cem serokatîyê. Piştî re tê Eyaleta Amedê û jî wir jî diçe Dêrsimê. Piştî şehadeta sekretêrê herêmê, ew dibe sekretêrê eyaleta Dêrsimê. Di 10'ê rêbendana 1994'an de li nêzî gundê Demanan, tevî komek hevalên xwe di şerekî şehîd dikeve.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

15 rêbendan 1992:

M. Salih Şahin (Xeyrî) şehid ket

Li Bozovaya Rihayê ji dayika xwe bûye. Malbata wî pir xizan bû. Ji ber rewşa aborî mecbûr ma ku here Ewropayê. Di sala 1980'yî de partî nas kir. Di navbera salên 1980-1986'an de li Ewropayê gelek peywir hilgirtine. Beşdarî Kongreya Sêyemîn a PKK'ê bû. Li rojhilat ma û piştî re çû Botan. Di Kongreya Çaremîn de, ji bo endamiya koneya leşkerî û komîteya navendî ya PKK'ê hate hilbijartin. Dema ku meş ber bi Xerzan çêbû, ew cigirê fermandarê eyaleta Xerzan bû. Li eyaleta Xerzan kete nav refên şehîdan.

Axînek ji dil:**Hozan Hogir**

Li Navenda Çanda Mezopotamya ji aliyê Hozan Hogir ve konserek bi beşdariya nêzikî 300 kesî ve hate lidarxistin. Hozan Hogir di konsera xwe de nêzikî bîst heb stran gotin. Beşek ji van stran gelêrî, sirûd (mers) û hinek jî kilam bûn.

Roja 3'ê rêbendana 1998'an li Navenda Çanda Mezopotamya ji aliyê Hozan Hogir ve konserek bi beşdariya nêzikî 300 kesî ve hate lidarxistin. Hozan Hogir di konsera xwe de nêzikî bîst heb stran gotin. Beşek ji van stran gelêrî, sirûd (mers) û hinek jî kilam bûn. Hozan Hogir bi giranî di konserê de stranên ku ji aliyê wî ve hatine çêkirin, pêşkêşî beşdaran kir.

Hunermendî bingeheke zor zîrek dixwaze. Roj bi roj hozan û komên muzîkê yê cur bi cur zêde dibin. Em vê yekê li Tirkiyeyê di nav NÇM û sazîyên din ên ku bi çand û hûnerê ve eleqedar dibin dibînin. Vê valahiya di çand û hunera kurdî de bi şewazên nû endamên ciwan ên ji xwe ewle dadigirin. Hozan Hogir jî, yek ji wan endaman e. Şewaza gotinê ya Hozan Hogir nîşana ji xwe bawerbûnê ye. Hozan Hogir dema di konserê de stran digotin axîneke zor kûr ji dilê wî difûriya. Vê axîna zor diwar hemû beşdar di bin bandora xwe de dihiştin. Ew valahî û hesreta hunerê di nav beşdaran ku di konserê de civiya bûn xwe bi awayekî zelal eşkere dikir. Di nav xwe de diaxivîn. Pêsnê hunerê didan. Belkî di şexsê Hozan Hogir de vê yekê xwe eşkere dikir, lê ew pesindayîn, pesindayîna hunera kurdî bû. Gel hunerê di çalakiyên wisa de nas dike. Ew xerîbiya li hemberî hunerê di danûstandinên bi vî awayî de ji holê radişe. Ji hal û wextê beşdaran ev yek derdiket holê. Dema ku Hozan Hogir kilam digotin, bêdengiyekê xwe li beşdaran dipeça. Lê dema ku straneke gelêrî bigota, laşê beşdaran li ser palgehên ji xweber diçû û dihat. Ji bo beşdaran, wisa xuya dikir ku zilmdayîna bû li ser palgehê rawestî. Ji aliyê din ve, divê hunermendî bi qasî stranbêjiya xwe, axivgerêkî baş be jî. Hozan Hogir ev yek jî



pêk dianî. Ji bilî stranên xwe bi henek û axaftina xwe jî, bala beşdaran dikişand.

Di xebata muzîkê de şexsaliya Hozan Hogir

Hozan Hogir, di sala 1993'yan de di nav komeke bê nav de dest bi karê muzîkê kiriye. Beriya vê bi du salan bi serê xwe xebatên muzîkê kiriye. Piştî ku du salan jî di nav vê komê de xebatên xwe dike, derbasî NÇM'ê dibe. Li NÇM'ê jî yekemîn car di nav Koma Gulên Xerzan de dest bi xebatê dike. Salekê di nav vê komê de xebatên xwe didomîne. Salekê bi şûn de dest bi hozantîyê dike. Me jî li ser xebatên wî yê muzîkê kurte-sohbetek pêk anî. Hozan Hogir diyar dike ku, niha bingehek bi her awayî hatiye avakirin. Armanç ew e ku em bikaribin li gorî vê bingehê tevbigerin. Dîsa Hozan Hogir vê yekê bi mînaheke wiha tarîf dike: "Dar hatiye çandin, dema ku em vê darê av bidin wê ev dar fêkiyên xwe bide me. Lazim e ku em, ji bîrê avê bikişînin û vê darê av bidin." Hozan Hogir hunermendiyê wekî karekî hêsan nabîne. Ji bo hunermendiyê kedîvê dibêje. Li gorî baweriya Hozan Hogir hunermendekî bê bingehekê bêkêr e, ne bi kêrî xwe ne jî bi kêrî gelê xwe tê. Lazim e ku hunermend ji nasnameya xwe haydar bin. Li gorî Hozan Hogir bi tenê stranbêjî hunermendî nîne. Pêdiviya hunerê bi kedê û bi rûmet zanîne, afirandinê heye.

A. WELAT/ STENBOL

ÇAVDÊRÎ**Di MED-TV'yê de tevlihevî û anarşiya termînolojiya kurdî**

AMED TÎGRÎS

B i gelemperî zimanê MED-TV tevlihev e. Her kesê ku bernameyekê pêşkêş dike yan jî nûçeyan amade dike, xwe zimanzan dizane, pey û termînolojiyê nû çêdike. Hinek kes wekî kevîrê ker in, mirov bêje-nebêje wekî ku qet nebihîstibin, roja din dema mirov temaşê li MED-TV'yê dike, şaşî û çewtiyên ku mirov bi saetan li ser gotûbêj kiribûn, dîsan her berdawam in.

Ez dixwazim di vê nivîsara xwe de, bi tenê li ser bikaranîna termînolojiya wan kesên ku di MED-TV'yê de dersên kurdî didin, rawestim. Bî taybetî di termînolojiya gramera kurmançî de tevlihevî û cudayetiyan mezin hene. Ev tevlihevî serê temaşevanan geş û tevlihev dike. Bi taybetî di televîzyonê de, pile û radeya hemû temaşevanan ne yek e. Temaşevan cur bi cur in. Yê jî dibistana destpêkê heta yê ku di dibistanên bilind de xwendine lê temaşê dikin. Tevliheviya termînolojiyê û zehmetiya metodan, temaşevanan û xwendekaran dilsar dike, hezkirina wan a hînbûnê kêmtir dike. Di warê pedagojî û perwerdeyê de encamên negatîv derdikevin holê. Wê demê dersdar, mamoste û televîzyon jî nagihîjin armanca xwe.

Di warê bikaranîna termînolojiya gramera kurdî de, tevlihevî û cudayetiyan ku ser û mejiyên temaşevanan tevlihev dikin, termînolojiya ku ez bi kar tînim (Di dibistana kurdî de) û ya di Zanîngeha Med de ku Huseyin Kartal, Zerdeşt Haco û Fêrgîn Melîk bi kar tînin, her yek tiştêkî seyr e. Ji yê herî seyr yek jî ev e, ku em her çar kes jî dibêjin: "Em li gorî gramera Celadet Bedirxan dimeşin.", lê dîsan jî cudayetiyan ew qas mezin in ku navbera me her çar kesan de derdikevin holê. Ev cudayetiyan me piranî li ser termînolojiya gramarê ne. Ez Fêrgîn Melîk didim aliyekî, ji ber ku ez bi xwe fêhm nakim ku ew çî dibêje û dixwaze çî hîn bike.

Huseyin Kartal di dersên xwe de termînolojiya almanî bi kar tîne. Wekî ku hemû kurd bi almanî an jî latînî dizanin û her kesî filojîyê xwendiyê. Ew gramera Celadet bi termînolojiya almanî dide hînkirin. Wekî; perfekt, împferkt, preteritum, kasus, objekt, subjekt û hwd....

Zerdeşt Haco jî bi termînolojiya almanî an jî bi ya latînî re, ya ku Celadet bi kar anîye xerab dike û dibêje. Wek mînak: Ji dema borî re dibêje 'dema buhorke', ji dema niha re dibêje 'nihoke'. Ji hevokê re dibêje 'komik'. Ji cînav re dibêje: 'cînavk'. Ji tewangê re dibêje 'Çimandin' Dibe ku bêje tewang ji zimanê erebî tê, lê yê din çima weha tî guhartin? Ez bi xwe fêhm nakim. Ez bi xwe jî giranî didim ser gramê û termînolojiya Celadet Bedirxan ku birayê wî Dr. Kamuran Bedirxan di dawiyê de li ser kar kiriye û guhartinên biçûk tê de çêkirine.

Ka bifirkirin, ew kesên ku ji xwe re dibêjin 'em li ser rêça Celadet Bedirxan in.' Heger di warê termînolojiyê de, di navbera van kesan de hew qas tevlihevî û cudayetiyan hebin, yê ku ne li ser rêça Celadet Bedirxan in, êdî hûn hesabê tevlihevî, anarşî û cudayetiyan wan bikin! Ez bawer im ku êdî komputerên nûjen ên herî dawiyê jî nikarin ji navê tevlihevî û anarşiya gramêrî û termînolojiyê derbikêvin.

Wekî tê zanîn Celadet Bedirxan û Roger Lescot gramera kurdî bi ya fransî ya nûjen re dabûn hemberî hevdu. Yanî di pîleyêke bilind de muqayese kiribûn. Ez bawer im ku ew gramera han bi termînolojiya xwe ve têr dike. Heger li gorî mercên îroyîn hin kêmasî û şaşiyên wê yê biçûk hebin jî, mirov dikare bi xebateke kolektîv û nivîskî bîne holê. Di vî warê de anarşî û tevlihevî her roj xwe di televîzyonê de dide der. Ji her seriyekî dengêkî cuda derdikeve. Bandoreke negatîv li ser temaşevanan dihele. Pêwîst e ku hevalên dersdar û mamoste li ser vê yekê rawestin. Li ser hinek prensîbên bîngêhî li hev bikin û pêşiyê li ber vê anarşî û tevliheviyê bigirin.

Divê muzîka kurdî li

mînim û di nava Koma Kedkar de ji xebatên min berdawam in.

Hûnê di encama van xebatên xwe yê lêkolînê de pirtûkekê çap bikin û wê kengî ev yek pêk were?

□ Belê, Niha gelek tişt di destê min de hene û xebata ku ez di vî warî de dikim, ez dixwazim gelek dorfireh bibê. Ji ber ku ez dixwazim tiştên hêja û mayînde derkevin holê, ez naxwazim lez bikim. Belkî şeş meh an salekê, pêşê wê pirtûkê ji çapê re amade be.

Em tim dibêjin, muzîka kurdî, gelo çi ye muzîka kurdî?

□ Berî ku mirov muzîka kurdî şîrove bike, pêwîst e mirov li ser pîrsa "muzîk çi ye?" raweste. Muzîk, ew hunera ku mirov hest û ramanên xwe bi

Geşedana muzîkê di sê merheleyan de pêk hatiye; qonaxa cihêbûna dangan, qonaxa ji hev cihêbûna melodî û xirecîrê û ferqayetiyan di nav melodiya muzîkê de ye. Vê yekê di dema klanan de dest pê kiriye û heta netewebûna gelan geş û zelal bûye.

riya dengên bi rêz û pêk der dibin. Muzîk îcad nebûye, muzîka ku li xwezayê heye, mirovahiyê ew derxistiye holê. Di vê mijarê de gelek teorî hene. Teoriya ku herî zêde tê pejirandin, teoriya "ragihandin û tîkildanîne" ye. Ji vê sedemê muzîka ku herî pêşî hatiye çêkirin; muzîka olî ye. Geşedana muzîkê di sê merheleyan de pêk hatiye. Qonaxa cihêbûna dangan, qonaxa ji hev cihêbûna melodî û xirecîrê û ya sêyemîn jî, ferqayetiyan di nav melodiya muzî-

kê de ye. Vê yekê di dema klanan de dest pê kiriye û heta netewebûna gelan bi demê re geş û zelal bûye. Di van qonaxan de li cografayên cihêreng û digel avakirina şaristaniyan û tîkiliyên aborî (bazirganî) û civakî, taybetiyên cografîk û hewayî (iklim), jiyana civakî û hwd. li ser geşedana muzîkê hîkari (bandor) kirine. Vê qonaxê, berî mîladê li dergûşa şaristaniyê, Mezopotamyayê dest pê kiriye.

Muzîka ku wekî me li jor çêl kiriye û ji wê demê ta îro hatiye, di bin van tesîran de teşe (form) girtiye, dirûv, seyra melodiyê, rîtmî di navbera dangan de û bi motîvên çandinî re hatiye honandin û bi zimanê kurdî tê gotin, jê re muzîka kurdî tê gotin.

Li gorî van mercan taybetiyên muzîka kurdî çi ne?

□ Pirseke xweş û di cih de ye. Teqez, vedîqetîne û ev yek ji bo muzîkên gelên din jî derbas dibe. Wekî tê zanîn, ziman hemû çanda gelan e, ji ber ku muzîk ji beşeke çandê ye, rola ziman jî tê de gelek mezin û girîng e. Lê, bi tenê ev jî ne bes e. Divê hin heman û taybetmendiyên din jî hebin, ev jî:

a) Pergala navber (navbera di nav notayan de); Pergala navber ya muzîka kurdî, ji parvebûna 17 parçeyên oktavê ku navbera wan ne wekî hev in, pêk tê. Ev sîstem, di muzîka kurdî de, ji dema berî çêbûna Îsa heta îro hatiye. Digel ku gelek lebatan li ser vê sîstemê bandor kiribin jî lê, ta niha jî wê ji xweseriya xwe tu tişt wînda nekiriye. Ev yek di van tabletên ku li sala piştî çêbûna Îsa di sala 280'yan de di vekolmên arkeolojîk de hatibûn dîtin û niha wan li "British Museum" a Londonê, tê selmandin. (Figura 'Nalê' û 'Harb' ku di destê Keybanûya Şûşand de, ji heyama Urartûyan maye.) Ev yek, di berhemên muzîkvan û zanyarên kurd û Rojhilata Navîn ên wekî Îbrahîm Mûsilî, Îşâq Mûsilî, Yahya Alî, Farabî, Seyfûdinê Urmîyeyî, Seyda Evdilqadirê Mêrgî û yê din de ev yek tê peyitandin (bi belgekirin).


b) Sazbûna rîtmîk; muzîka kurdî bes ji qaîdeyên basît pêk nayê. Çi ji alî reqsê (dans) ve û çi ji alî jiyana aborî, demên şer û aşî ve û çi ji ber hîkariyan demên xurt û lawaz bi meşînên leng-kulek û bi welweleyên cihêreng tîjî bûye.

c) Herîkîna dangan; ji aliyê seyra dangan ve jî, muzîka kurdî gelek meqaman di nav xwe de dihevine. Ji vê yekê ne tonal e, bi dengên bîngêhîn (hîmî) xemilandine. Meqamên ku îro di "Muzîka Hunerî a tirkan" de tên xe-

bitandin, di hîma, wan de meqamên muzîka kurdî hene. Ji van meqaman çarîn şeş heb û ji meqamên pêncîn çar heb ên kurdî ne. Ev jî meqamên; Rast "Kurdî" "Çargah" û "Uşak (Newrozî)" in.

d) Muzîka kurdî, ji aliyê şewaz, dirûv û dengên melodîk ve jî taybetiyên xweser di xwe de dihevin. Wekî nimûne: Şeweya strandina lawij û dilokan (klam) bi çi zimanî bê gotin jî xwe eşkere dike û diqîre, dibêje; "Ez kurdî me"

Hûn cihê muzîka kurdî ya di pêvejoya



Berî her tiştî em dikarin Veysi Varlı binasin?

□ Ez di sala 1958'an de li Amedê ji diya xwe bûme. Min dibistana seretayî û navîn li Amedê xwendiyê. Ez berê li saziyeke dewletê karmend (memur) bûm û min demekê jî sendikavaniya karmendan kiriye. Di sala 1993'yan de li ser navê "Platforma Demokrasî ya Amedê" daxuyaniyek çapemeniyê me li dar xist. Dewletê, ew kesên ku ev daxuyanî îmze kiribûn, darizandin û li me ceza hat birîn. Piştî ku em li girtîgehê razan, dawî li karê me yê karmendiyê hat.

We çawa dest bi muzîkê kir, kîjan sedeman bandora xwe li ser we hişt û heta niha xebatên ku we kirine çi ne?

□ Ez bi loriyên dayika xwe mezin bûme. Dengê muzîka ku min pêşî bihîst, melodî û awazên bilûra bavê min bû; ev jî muzîka kurdî bû. Di bin tesîra dengê bilûra bavê xwe de min hîn di zarokatiya xwe de dest bi jenandina bilûr û filûtê kir. Lê belê, tîkiliya min a bi muzîkê re bi şeweyekî cidî û rastîn di sala 1970'î de dest pê kir. Lê wan şalan, bi guhdarkirina muzîka Aşiq Îhsanî re ez bûm xwediyê awîreke muzîka ku alîgirê kedkarî û azadîxwaziyê ye. Ez ji sala 1977'an heta sala 1980'yî bi hunermendên muzîka kurdî yê wêkî Dilgeş, Amed, Rojhat, Bêrfvan û Nesrîn re xebitîm. Me gelek kaset tomar kirin û di wê pêvajoyê de di warê muzîka kurdî de min gelek tişt berhev kirin. Ji sala 1989'an û vîr de ez li ser muzîka kurdî lêkolîn û lêgerînên zanistî pêk tînim û ev karê min hîn jî didome. Niha jî, ez li NCM'ya şaxa Amedê xebatên perwerdekirina muzîkê dido-

Her koka xwe şîn bibe

dîrokê de, tîkiliyên wê yên bi muzîka cîhanê re û di vê çarçoweyê de, vê muzîka kurdî ku van salên dawîn tê çêkirin, çawa dinirxînin?

□ Gelê kurd ku li dergûşa şaristaniyê di Mezopotamyayê de ji destpêka dîrokê û heta niha jiyaneke dêmanî berdeham kiriye, di nav vê pêvejoyê de kurdan, muzîk di demên şer û aştîyê de bi kar anîne. Misrî, İspanî û zêdetir ewrûpiyan dema êrîş birine (seferên xaçperestan) ser warê kurdan û bi taybetî jî gerokên ewrûpî dema li Kurdistanê geriyane, di vegerê de ji Kurdistanê amûr (enstrûman) ên muzîkî,

sikala û hêmanên muzîka kurdî bi xwe re birine welatê xwe. Bo nimûne 'Bîsq'ê ku amûreke muzîka kurdî ya sereke ye, bizansiyan ew ji Kurdistanê birine Yewnanîstanê û li gorî sistema Tempeman ew perde kirine û navê wî niha 'Bîzûgî' ye. Kurdan, muzîk bi pîrmebestî bikar anîne. Ji bo şer mîna 'Defa Hawarê' di şîn, şahî, piskaterapî, ayînên olî û di xwedîkirina zarokan de û li gelek warên din ji sala 1300'î bi vir de tê xuyakirin ku muzîka kurdî bûye navgîna jiyandina ziman, dîrok û wêjeya kurdî. Muzîka kurdî di lorîkên dayikan de, li ser zimanê dengbêjan, di melodiya bilûr û naleya şivanan de û di qesîydeyên feqîyan de, heta niha karibûye xwe biparêze.

Rêbaz û sistemên muzîkî ku zanyarên kurdan ev sistem di salên 1300'î de li zanîngehên Hewlêr, Mûsil, Urmiye û li Amedê xebitandine û bi pêş ve birine, hîn îro jî ji aliyê pîr gelan ve tên bikaranîn. Ev sistema 'nota'yan ku "Gudiyo D' Ares" di sedsala 11'min de çêkiriye û niha li dinyayê tê xebitandin, bi rastî jî kurdan ev sistem di sedsala 6'an de bi navê 'notaya Ebcêd-kîndî' afirandine û ji wê demê de kurdan ew bikar anîne. Çi heyf ku kurdan tiştên ku di warê muzîkî de heta sedsala 13'emîn afirandine, ji wê demê heta sala 1830'î tiştêk nedan ser û yê amadekirî xwarine. Niha jî, nemaze kurdên bakurî li ser navê nûjenkirina muzîka kurdî xeletî û çewtiyên mezin dikin.

Ji kerema xwe re hûn dikarin hinekî van xeletî û çewtiyan vekin?

□ Niha di dema damezirandina Tirkiyeyê de hinek ciwanên tirk ên wekî Adnan Saygun, ji ber ku li Ewrûpa xwendibûn, di bin tesîra muzîk û çanda ewrûpiyan de mabûn. Wan, xwest muzîka xwe bikin pîr-deng û bi dinyayê bidin pejirandin. Digel ku gelek keda xwe rijandin jî, ne muzîka tirkan bi dinyayê dan pejirandin û ne jî ew muzîka xwe bi gelê xwe dan hez kirin. Muzîka wan jî "Popa tirk" an jî popa Anatoliyê wê de neçû. Îro jî, hinek ciwanên kurdan ku li metropolan û li Ewrûpayê dijîn, li ser navê dewlemendkirina muzîka kurdî qirkirina muzîka kurdî pêk tînin. Ev muzîka kurdî ku digel ew qaş dizîfî, talan û pişaftînan li ser piyan maye. Tîrsa min ew e ku wê ji ber van xeletî û çewtiyan winda bibe. Kesine ku li ser navê çêkirina muzîka kurdî wê yekê dikin, ew muzîkê wekî metayê dibînin. Kesin hene ku bikaranîna amûrên wekî gîtarê mîna egera bîngêhîna a muzîka nûjen dinimînin. Solîstê Koma Amed Serhad,

digel ku xwediyê teknîkek gelek baş e û pîr hêja awaz û dengê muzîka kurdî ji qirika wî derdikeve û ev yek jî gelek hêsantir rê dide ku ew karibe vedenga muzîka kurdî bi kar bîne lê, çî heyf ku wî xwe kiriye esîr û dilê sistema tempeman ya ewrûpî. Dîsa, vedenga frekansa muzîka kurdî ya 11/12 (11 li ser 12) jî bi şeweyekî dûrî dengên komal bi kar tîne. Pîrê wan jî ne bi kakil (naverok) re, bi dirûv re mijûl dibin. Divê, ji xebatên muzîkî re kakil bîngêh be.

Mîna keke din jî; min di sohbetekê de ji Mehmetê Koma Dengê Azadî pîrsî bû ku çima ew li ser rêz û rêçikên muzîka kurdî namesîn û tim di muzîka wan de heyraniya Ewrûpiyan xwe dide der û muzîka lasayî (taklît) çêdikin?, wî jî gotibû: "Ez ji muzîka bi vî rengî hez dikim. Lewre min her tim ev muzîk bihistiye û ez wîha fêr bûme." Bi rastî ew muzîk ne ya kurdî ye. Mirov dikare bibêje: "Muzîka bi zimanê kurdî." Pasteya ku di firinê de bipije, mirov dikare ji pasteyê çêja nanê tenûrê hilgire? Lê, kesên ku li ser şopa rast

**Gotineke pêşiyar
heye, dibêje: "Her
giya li ser koka
xwe şîn dibe."
Çawa ku em
nikarin**

**bêrîvanekê bi milên
tazî û dawa kinik
ya bajariyan xeyal
bikin. Xeyalkirin û
ramîna muzîka
kurdî ya ji reh û
koka xwe dûr jî bi
vî rengî ne gengaz**

•

dixebitin, hejmara wan jî ne hindik e. Ez dikarim ji wan kesên ku li ser muzîka kurdî xebatê dikin re wê bibêjim; bila muzîka kurdî baş dahûrînin, binasin û lê binihêrin. Divê, em vedeng û sikala ya muzîka kurdî jî baş binasin.

Amûrên muzîkî yên kurdî çi ne?

□ Amûrên (enstrûman) muzîka kurdî mirov dikare wîha rêz bike: Amûrên ritmê: Def (dahol), erbane (bênder), Amûrên din: Nale (mey), bilûr, tembûr

(sêta-baxlama), bîsq (data), ûd, (şes ta), ribab (kevanek), zûrne (gelê Qereçî ji Hindistanê koç kirine, zurne bi xwe re anîne Kurdistanê. Kurdan ew amûr di muzîka xwe de bi kar anîne û bi demê re çî ji aliyê bejnê ve û çî ji aliyê sikala û vedengê ve gewşînên muzîka kurdî girtine), santûr, qanûn û li demên berê jî "harb" hatiye bikaranîn.

Wê muzîkvanên kurd, muzîka me bi çî rengî li dinê bidin pejirandin?

□ Divê, em muzîka kurdî baş bizanibin, normên ku li cîhanê jî tên pejirandin baş bizanibin. Bêyî lasayîkirinê li ser hîme kevneşopî ya muzîka kurdî bi awayekî nûjen û hemdem biramin. Heke em karibin van yekan wekî kevîrên domînoyê baş û rast li cihê wan deynin, muzîka kurdî jî wê cihê ku heq kiriye bi dest bixe, ez hêvîdar im wê saziyên me jî di vî karî de performan-seke qenc û xurt bidin nîşan û rola xwe jî baş bilizin.

We got sazî, NÇM di warê xebatên çanda kurdî de çiqas bi ser ketiye û xebatên akademîk divê çawa bin?

□ Bi ya min, NÇM jî, roja ku ava bûye heta niha, tiştên dikeve ser milê wê, bi layiqî dixwaze bi cih bîne. Hewleke xurt dide xwe û ji bo wê yeke jî gelek berdêl dane. Tu endamê wê nîn e ku du-sê çaran nehatibe binçavkirin. Arşîvên wê yên ku bi gelek zehmetî û dijiwariyan hatine darêjtin û berhev kirin, çendan çaran ji aliyê dewletê ve hatine talankirin û wêrankirin. Divê, neyê jibîrkirin ku sazî, dikare bi arşîv û endamên xwe xebatên akademîk bike û berhemana biafirîne. Xebatkarên çand û hunerê di bin banê saziyan de çî xebatên ferdî bin û çî jî di xebatên komeleyî de divê qedrê xebatên akademîk baş bizanin. Ji bo lêkolîn û lêgerîna muzîkê û bi giştî ya çandî divê kom bîn avakirin û bi pisporî xebatên xwe bimeşînin. Ez bawer im wê di encama xebatên bi vî rengî de berhemên hêja derkevin holê. Ev ne bi tenê barê NÇM'ê ye, barê me tevan e.

Gotineke pêşiyar heye, dibêje: "Her giya li ser koka xwe şîn dibe." Çawa ku em nikarin bêrîvanekê bi milên tazî û dawa kinik ya bajariyan xeyal bikin. Xeyalkirin û ramîna muzîka kurdî ya ji reh û koka xwe dûr jî bi vî rengî ne gengaz e. Bi van dîtin û nêrfînan ez silavan li her kesê ku aligirê ked û azadiyê ye dikim.

HEVPEYVÎN: ROŞAN LEZGÎN

Nivîskar Felat Dilgeş:

M. Cizîrî helbestvanê kesên bijarte bû

Felat Dilgeş, Ahmedê Xanî dişibîne Platon, Melayê Cizîrî jî dişibîne Arîstoteles. Li gorî Dilgeş, di dinyayê de tu kes bi qasî A. Xanê nefsbîçûk nîn bûye. Qurefî pê re qet nîn bûye. Di hemû berhemên xwe de nefsbîçûkiya xwe li ber çavan raxistiye. Lê, li gorî nirxandina Dilgeş, Melayê Cizîrî zor qure bûye.

Roja şemiyê li Med-komê semînerê li ser Melayê Cizîrî ji aliyê nivîskarê rojnameya Hêviyê Felat Dilgeş ve hate dayîn. Felat Dilgeş di destpêka axaftina xwe de li ser peyva klasîk û klasîzmê rawestiya. Li gorî Felat Dilgeş nivîskar Tolstoy û Yaşar Kemal ji nivîskarên klasîk in. Tevî vê yekê Dilgeş da zanîn ku peyva klasîk û klasîzmê îro bêhtir forma globaliyê standiye. Ew di berdewama axaftina xwe de li ser edebiyata kurdî jî bi awayekî giştî rawestiya. Dilgeş diyar kir ku kurdan bi zimanê xwe wêjeya xwe nenivîsandine. Yên ku nivîsandine jî M. Cizîrî A. Xanî û F. Teyran û hwd. in. Ev tiştên din ku hatine nivîsandin di medreseyan de hatine nivîsîn.

Her wiha Felat Dilgeş di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku di berhemên edebî de, yê ku niha di destê me de bêhna oldarî bêhtir difûre. Nivîskar Dilgeş Ehmedê Xanî jî di nava vê çarçoweyê de nirxand.

Dilgeş li ser Melayê Cizîrî daxuyand ku, mirov nikare tarîxeke tekûz ji bo dema ku ew tê de jiyaye diyar bike. Bi awayê ku Felat Dilgeş got, Celadet Bedirxan jî di heman baweriyê de bûye. Lê Felat Dilgeş di berdewama axaftina xwe de wekî nêzîkî tarîxeke mutlak sê şerefxanan destnîşan dîke. Ji van her sê şerefxanan, yek heye ku li gorî gotina Felat Dilgeş, Melayê Cizîrî di dema wî de jiyaye. Ev şerefxan di sala 1597'an de jiyaye û şerefxanê duyemîn e. Dilgeş wekî mînak diyar dîke ku, dema Cizîra Botan ji aliyê Akkoyunlar ve tê dagirkirin ev şerefxanê duyemîn Cizîra Botan ji destê wan rizgar dîke. Ji ber ku Cizîrî di helbesteke xwe de pesnê şahekî ango mîrekî daye. Di heman helbestê de peyva Kurdistanê jî derbas dibe. Dilgeş her wiha daxuyand ku, ev pesindayîn ji bo îdarekarê Cizîra Botan e. Ev helbest ji bo Cizîrê ye, Melayê Cizîrî jî wê demê jiyaye. Ji aliyê din ve li gorî nivîskar Dilgeş, Melayê Cizîrî bi gelek bernavan (mahlas-lakap) helbest nivîsandine. Navê Cizîrî ji dibe ku yek ji wan bernavan be.

Dilgeş di dîmahîka axaftina xwe de, da zanîn ku du şirazyên farisî hebûne. Melayê Cizîrî li ser van her du Şirazyên jî helbest nivîsandine. Bi boçûna Dilgeş, Melayê Cizîrî gelekî bi xwe

ewle bûye. Dilgeş diyar dîke ku di Ehmedê Xanê de ew qasî jixwe ewlebûn nayê dîtîn. Ji aliyê din ve Dilgeş da xuyakirin ku Mehmed Uzun jî Melayê Cizîrî kiriye hemdemê Hafîzî Şirazî "1570-1640", ev ne tiştê durîst e. Dilgeş paşê jî diyar kir ku li gorî pêzanînên di dest de di navbera Melayê Cizîrî û Hafîzê Şirazî de 80 sal hebûye. Cizîrî dibe ku

ji hafizan haydar be. Lê ne di dema wan de jiyaye. Her wiha Felat Dilgeş daxuyand ku Melayê Cizîrî di helbestên xwe de li dijî her du hafizan rawestiyaye.

Di berdewama sohbetê de Felat Dilgeş, Ehmedê Xanî dişibîne Platon, Melayê Cizîrî jî dişibîne Arîstoteles. Li gorî Dilgeş di dinyayê de tu kes bi qasî A. Xanê nefsbîçûk nîn bûye. Qurefî pê

re qet nîn bûye. Di hemû berhemên xwe de nefsbîçûkiya xwe li ber çavan raxistiye. Lê, li gorî nirxandina Dilgeş, Melayê Cizîrî zor qure bûye. Wî, her dem hostetiya xwe derxistiye pêş. Dilgeş daxuyand ku, Melayê Cizîrî di helbesta xwe de li dijî hafîzekî rawestiyaye, wî tu carî berhemên farisî di ser ên xwe re nedîtine. Li gorî Dilgeş Melayê Cizîrî

Xanî bi zimanekî hêsan nivîsandiyê, lê Melayê Cizîrî bi felsefeya xwe her dem xwe veşarî hiştiye. Dilgeş diyar dîke ku di gelek helbestên wî de bêjeyên farisî-erebî hatine nivîsîn û Melayê Cizîrî xwe bi hêsanî nade dest; peyvên wî wekî mifteyê ne.

Li gorî dazanîna Felat Dilgeş, berî A. Xanî kesî qala netewebûna kurdan nekiriye. Bi ramana Dilgeş Melayê Cizîrî welatparêzekî baş e. Lewre wî pesnê mîrê Kurdistanê daye, her wiha jî wî xwe ji rexnekirina wan jî nedaye alî. Cizîrî li dijî dagirkeriyê bi awayekî diwar rawestiyaye. Ev helwesta xwe jî di helbestên xwe de aniye zimên. Lê dîsa jî ew negihîştîye bîr û bawerîya netewetiyê.

Piştî ku Dilgeş li ser taybetiyên Cizîrî rawestiya hat ser mijara "di helbestê de helwesta Cizîrî. Dilgeş diyar kir ku di tu helbestên Melayê Cizîrî de peyva 'tirk' bi başî nehatiye bikaranîn. Li gorî bawerîya Felat Dilgeş ev yek nîşana neteweperweriyekê ye.

Edebiyata tasawûfî

Di sohbetê li ser jiyana Melayê Cizîrî de wekî ku Felat Dilgeş jî diyar kir ku Cizîrî di helbestên xwe de pir girîngiyê dide tasawûfê. Cizîrî însanekî ji dil e. Her wiha Melayê Cizîrî di edebiyata klasîk a kurdî de dil neqîşandiyê. Kesî wekî wî nekiriye. Dilgeş li ser vê mijarê wiha got: "Tu dibêji qey Cizîrî bi dil fikiriye." Nivîskar Dilgeş da zanîn ku li cem Melayê Cizîrî sîfatên yarê gelek in û ew sîfat bi şeweyekî pir rengîn û bî kûrahî hatine neqîşandin. Dilgeş di berdewama axaftina xwe de diyar dîke ku ji bo Melayê Cizîrî dil, hem xêmgînî û jan hem jî dilxweşî dilşadî û kêfxweşî bûye. Ji van gotinan tê fêmkirin ku felsefeya Cizîrî bandorekê gelek mezin li ser Dilgeş hiştiye.

Di dawîya bernameyê de Felat Dilgeş rexneyên xwe li ser kêr beşdariyê anîn zimên û got, "Em li Londonê bin jî, li Stenbolê bin jî sohbetên der barê edebiyata kurdî de bi kêr-beşdariyê derbas dibin." Dil dixwaze ku beşdariyeke pirtir di çalakiyên bi vî rengî de hebe. Lê çî heyf ku mirovên kurd hê tê negihîştine ku heta em wêjeya xwe ya klasîk baş nas nekin, em nikarin wêjeyeke nûjen saz bikin.

AZAD ALTUN



Melayê Cizîrî

xwe her dem di nav şairê zana û qata jorîn de dibîne. Ev xîtabî kesên bijarte dîke.

Semînerdar Felat Dilgeş taybetiyên Melayê Cizîrî jî wiha rêz kirin; Ew pozbilind e, qure ye û zana ye. Di edebiyata xwe de, xwe her dem di nav qata rajorîn de dibîne. Ji aliyê din ve Felat Dilgeş Ehmedê Xanî jî Melayê Cizîrî bêhtir zelal dibîne, lewre Ehmedê

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

- **10.01.1998 Şemf:** Teatroya Jiyana Nû: Komara Dînan: "Şermola", saet: 14.00. Sohbet: Fîlmê Masumiyet û Sînema, derhêner: Zeki Demirkubuz, saet: 17.30
- **11.01.1998 Yekşem:** Konsera Koma Vengê Sodirê, saet: 17.30
Li BEKSAV'ê
- **10.01.1998 Şemf:**
Bîranîna Onat Kutlar, Axilger: Atilla Dorsay, Orhan Duru, Sennur Sezer, Adnan Özyalçınar, saet: 15.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'a İzmîrê


- **10.01.1998 Şemf:**
Panel: "Siyaseta dewletê yê li ser girtiyar."
Axilger: Av. **Medenî Ayhan** (Serokê TUHAD-DER)
Eyûp Karakeçeli (Serokê HADEP'a Edeneyê)
Av. **Kemal Kurlangıç**, Av. **Cabbar Leygara**, saet: 18.00
- **11.01.1998 Yekşem:** Mizansen û semah: "Pîro û Zalha" K. Kendal, saet: 18.00
- **16.01.1998. Fr:** Konsera Koma Gülên Xerzan, saet: 18.00

Hasan Özgün ne navdar e, lê rojnameger e

Di sala 1993'yan de li Amedê nûnerê Rojnameya Özgür Gündemê Hasan Özgün ji aliyê JITEM'ê ve hate binçavkirin. Piştî wê rojê Hasan Özgün hew hate berdan. Hasan Özgün rojnamevanek bû, wekî her rojnamegerî. Lê di çav hinekan de ew ne wekî her rojnamegerî bû. Rojnamegeriya wî li gorî zagon û hiqûqa Tirkîyeyê milîtanî bû. Milîtanekî çekdar. Ge-lo kî bû ev milîtanê çekdar? Çeka wî çi bû? Ew çekdarê rastiya Tirkîyeyê yê ji sedan sal û vir de bû. Çeka wî pênûs bû. Lê rayedarên dewletê ji siya wê pênûsê ditirsîn. Lewre bi wê "çekê" tevkujiyên ku hatine serê gelê kurd hatibûn nivîsandin. Dîsa wê çekê hovîtiya dewleta tirk bi hemû cihanê dabû nasandin.

Heke hinekî din destê xwe bi lez negirta, wê rûyê rastî û ve sîstema kirêt derketa holê. Ev sîstema kirêt li gorî zagon û hiqûqa xwe jî tevnedigeriya. Yek çare hebû, diviyabû Hasan Özgün bibûya "cudaxwaz" û endamê rêxistineke nehênî. Ev senaryo pêk anî û Hasan Özgün ji layê DGM'ê ve di sala 1995'an de bi cezayek giran hate tewanbarkirin; 12 sal û şeh meh. Pêşî ew birin Girtîgeha Amedê, piştî re jî Girtîgeha Aydinê. Niha jî Hasan Özgün di Girtîgeha Aydinê de ye. Êdî ji bo vî rojnamevanê kurd jiyaneke nû dest pê kiribû. Diviyabû jiyana xwe ne li gorî rojnamevanekî, wekî dilekî ku di şer de ketiye destê dijmin, bidomîne.

Ev çar sal in ku Hasan Özgün di girtîgehê de ye. Piştî Hasan Özgün gelek rojnamevan ketin girtîgehan û derketin. Hinek ji wan bi daxwaza hevpişeyên wan ên ewrûpî, bi hinceta nexweşiya xwe hatin berdan. Em li rojnamevanê xwe xwedî derneketin. An me bîr nebîr an jî me sersariyeke gelekî mezin kir. Işık Yurtçu nexweş ket, me hemû cihan rakir ser piyan. Em jî tevî wê yekê rabûn ser piyan. Metin Göktepe hate kuştin. Me dev ji rojnamegerên xwe berda, em bi pey kujerê wî ketin. Me jî xwe avêt pêla ku bilind bûye, em ketin pey doza kesên navdar. İro Hasan Özgün, ji ber nexweşiya xwe bel-



kî nikare ji nav livînên xwe jî derkeve. Lê hê jî em bi awayekî ne ji dil tevdigerin. Me mesele hewaleyî sazgehên biyan kiriyê. Kampanya hatine destpêkirin, lê bi qasî çaryeka kampanyayên ku ji bo Işık Yurtçu hatibûn destpêkirin, nabin.


Hemû saziyên ku xwe muxalîfî ve sîstemê dibînin, çima heyetan ji bo dîtina Hasan Özgün bi rê nakin? Çima ev sazî û kesên ku xwe rewşên bir dihesibînin li rojnameger Hasan Özgün bi awayekî ji dil û can xwedî dernakevin? Lewre Hasan Özgün ji doza PKK'ê hate darizandin. Ew nikarin nêzîkî wî bibin. Hasan Özgün nexweş be jî, li ber mirinê be jî, xwe-jê dîr dixin. Çima xelatên rojnamegeriyê ji bo Hasan Özgün nayên dayîn? Ji ber ku wî li Kurdistanê di nav tanq û topan de karê xwe dikir. Ew nebûbû stenbolî. Lewre jî kesî ew nas nedikir.

Sendikayeke bîtanî ji me leztir tevgeriya. Ji bo Hasan Özgün kampanyayek daye destpêkirin. Wê bi vî kampanyaya xwe dewleta Tirkîyeyê bide ber zixtikan. Ka emê kengî ji ber xwe bîr bibin hin tiştan û peywira xwe bi cih bînin?

AZAD ZÊRO

TÎŞK

Yew game ravêr di gamî



LERZAN JANDÎL

Bê guman na 14 serrî yo, tevgera rizgariya welatê ma de game zaf ebi bingeyî û qedrî amê eştene. Virêndiye herketê rizgariye û bado jî şarê ma, yanê dewije, ma roşnavîrê ma, karkerê ma, xort û azebanê ma, cem û camêrdanê ma seba azadî û rizgariya welatê ma ha koyanê ma de, ha dîplomasî de, ha organizekerdena şarê ma de gelê ravêr şiyê.

La belê duştê na ravêrşiyene de, yanê duştê na gama ravêrî, tayê kesî ebi zanayene yan jî ebi nêzaneyene wazenê di gaman pêyser sorê û ma jî, yanê şarê ma ji xo de pêyser berê.

Manaya nayê çik a?

Se ke wendoxê rojnameya Azadiya Welatî jî zanê, tayê kesê ke xo rê para roşnavîriye vecenê, yan jî dînan rê para roşnavîriye êna dayena, cayo hop hazir de dest bi tenê meseleyan kenê, ke ne kare nînan resena şarê ma, ne jî dem demê nê meseleyan o.

Meselaya ziwani/zonî ser ro, yanê zonê kurdan ser ro zaf rayan amo û huna jî êno qesekerdenê.

Zonê kurdan çik o?, çand zaravê xo estê? nê, zaravî yewbînan/jûbînî ra çîqa dîrî yê, yan jî nêzdî yê? Sebebê nê zaravan û fekan çik o? Ma-se şikînimê nê probleman, persan çareser bikerîme?

Her kese qasê zanayena xo, qasê waştana xoya polîtîke, qasê fêl û nêto xo cewabê nê persan û çareserkerdena nê probleman do. Bê guman naca de fikrê ke yewbînan ra zaf ciya yê jî estê, La belê fikrê ke na pêyniye de erziyê wertê, fikranê bînan ra zêde ciya yê.

Tayê kesê ma sarê xo ebi resmî, fermî werdo. Vanê resmî, çiyê de bîn nêvanê.

Ti vana, peynê mordemî qe binê teror û zordariya îdeolojiyê resmî, zordariya Tirkîye de nêmendê. Qe hespan, zîndanên nêkewtê, qe îşkence nêdiyê!

Ti vana, qey nê mordeman resmîyê Tirkîye, İraq İnan û Suriye ra xêre diya. Û wazenê na xêre bêro sarê şarê ma jî ser.

Ez bi xo bawer nêkena, ke raştiya ma, welatê ma, şarê ma zê nê mordeman a, zê qeydo ke ê fikirîme ya. Nê mordemî raştiya ma ra dîrî yê. Nê mordemî hîrafikiriyên û hîrabiyene ra dîrî yê. Nê zaf teng ê. Wazenê, ke her çî zê dînan bo, her kes zê dînan bîfikirî. Nê kesî ebi nayê jî xizmeta şarê ma, xizmeta çareserkerdena problemanê şarê ma nêkenê, labelê şarê ma miyan de problemanê neweyan/newiyan, ciyatiyanê neweyan vecenê.

Naca çiyê tewr xirab o o wo, ke eke nê kesî tenge de manenê, xo erzenê pê şarê ma, pê yewtiya şarê ma û yan jî xo erzenê pê tevgera rizgariya welatê ma. Yanê ebi kilmiye xo erzenê pê kesenê, ke seba azadiya welatê xo goniya xo rişna, canê xo kerdo feda û huna jî keno feda.

Wunciya nê kesî eke tengê ra xelesiyayî ra jî qe kesî nêşinasnê/nas nêkene. Xo miyan de/ merkez de vînenê. Angorê dînan ganî her çî girêdayîye nînan bo, dormê nînan de bibo.

Ez naca rêyna vana: Ma ebi hundê ked û emegê, ebi qedrî çareserkerdena problemanê xo yew game ravêr şime. Ma di gaman pêyser meberê, sebebê na xirabê mebe!

Ez ebi na hêviya serra 1998'î şarê ma rê pîroz kena, serkewtina wazena.

Şivan û paşa (1)

Paşayek hebû, welatê wî gelekî fireh û dewlemend bû, xwediyê gelek leşkeran bû. Lê wî paşayî qedrê welatê xwe û leşkerê xwe nizanibû. Rojekê Wezîr ji paşayê xwe ra dibêje:

– Paşayê min, ka were em carekê li nav welatê xwe bigerin. Paşa û wezîrê wî kincên derwêşan li xwe dikin xwe dikin wekî mirovên pejmûrde û ji hevketî. Da ku tu kes wan nas neke.

Paşa û wezîr dest bi gera xwe dikin. Cih bi cih, malbat bi malbat, gund bi gund, serdan dikin. Mîna qeleçiyân (gurbet) bi rojan gera xwe didomînin. Lê tu kes jî nizane ev her du mirov paşa û wezîr in. Ji ber ku timtêla xwe guhartibûn. Li ku dibû şev, li wir diman.

Rojekê bi tesadûfî paşa û wezîr diherin mala şivanekî xizan û li wî dibin mêvan. Berî ku derbasî mala wî şivanî bibin, dibînin ku eyarê kûçikê tijî ka ye û bi piştê deriyê malê ve daliqandî ye. Ev yek ji paşa û wezîr re dibe meraqeke mezin. Şivên bi wan re xweş û başî kir. Li rîşwa wan pirsî û got:

– Hûn kî ne? Bi ku de diherin? Paşa bersiva şivan da û got:

– Em mirovên derwêş in, ji xwe re parsê dikin. Me got em pariyek nan li ba te bixwin.

Şivan:

– Li ser çavên min hûn hatine. Deriyê min ji her mirovî re vekiriyê.

Paşa bi rûyekî li ken gote şivan:

– Te ji bo çî ev eyarê kûçik bi pêşiya deriyê xwe ve daliqandî ye? Weleh hinekî ji me re bû meraq.

Şivan:

– Ew qas pêwîst nake ez bibêjim.

Heyanî wê hingê pîreka şivan ji wan re du tas dew anî. Danî pêşiya mêvanan.

Wezîr jî bi rûyekî li ken:

– Ger tu wateya vê bûyerê ji me re nebêjî, ji bo çî te wiha kiriyê, em dew venaxwin.

Şivan:

– De dewê xwe vexwin, pir serê xwe neêşinin.

Paşa ji wezîrê xwe re bi hêdika got:

– Gava nan ji me re anî, emê bêjin, em nanê te naxwin, heyanî tu ji me re vê meseleyê nebêjî. Hingê dilê wî wê bi me bişewite, wê ji me re bibêje.

Şivan mirovekî pir camêr bû. Rabû berxek ji mêvanê xwe re serjê kir. Piştî demeke kin derbas dibe, sifreya nênan amade dike û tîne ji mêvanên xwe re.

Paşa:

– Em nanê te naxwin. Heyanî tu vê meseleyê ji me re nebêjî.

Şivan:

– Hûn serbest in. Dixwazin bixwin, dixwazin nexwin. Hûn

dizanin ger hûn bixwin baş e.

Paşa û wezîr wê demê nanê xwe naxwin û ji mala şivan derdikevin û diherin.

Paşa dihere qonaxa xwe. Dev ji gera xwe berdidin. Kincên derwêşan ji xwe dikin, kincên fermî yê paşatiyê li xwe dikin. Paşa ferman dide wezîrê xwe û dibêje:

– Zû du peyayan bi rê bike, wî şivanî bila binin ba min. Wezîr di cih de fermana paşa pêk anî. Du peya bi rê kirin pey şivan.

Ew du peya li hespên xwe siwar bûn, berê xwe dan gundê şivan. Piştî ew digihîjin gund mala şivan, şî şivan re wiha dibêjin:

– Paşa û wezîr te dixwazin. Şivan xwe amade dike û bi wan re tê ba paşa û wezîr. Lê şivan hinekî ditirse, ji ber ku tu carî paşa nedîtibû.

Paşa:

– Tu bi xêr hatiye şivan.

Şivan:

– Tu di nav xêrê de bî paşayê min. Tu tim hebî mezinê min.

Paşa:

– Ez û Wezîrê xwe, em hatin mala te.

Lê te gelekî ji bo me camêrtî kir. Tê bîra te?

Şivan:

– Paşayê min mirovekî mîna te mezin, ew qas xwediyê mal û milk nabin mêvanê mirovekî wekî min xizan û reben.

Paşa:

– Ma nayê bîra te, du derwêş hatibûn mala te. Ew du derwêş ez û wezîr bûn. Êdî dev ji hatina me berde. Ka ji min re bibêje te ji bo çî ew eyarê kûçik li pêşiya deriyê malê xistiye?

Şivan:

– Paşayê min, tu çî ji min dixwazî bixwaze, lê dev ji vê pirsê tenê berde û ne ji ez hewal bidim.

Paşa bi bêhneke teng, lê dîsa jî bi rûyekî bi ken:

– Tu mirovekî xizan û reben î. Dev ji vê serhişkiya xwe berde! Ji Paşayê xwe re vê meseleyê bibêje. Ezê gelek zêr û mal bidim te.

Tu yê jî dewlend bibî.

Şivan dîsa xwesteka paşa napejirîne. Ji ber ku şivan girêdayî gotinên xwe bû.

Şivan:

– Malê te ji me re nabe, ji bo vê meseleyê.

Paşa di nava xwe de gelekî aciz dibe, awirên çavê wî tûj dibin. Wekî ku ji xwe re dibêje; “Ez Paşayê wî welatî me, ew qas mirov di bin destê min de ne, çawa ewê belengaz tiştan ji min re nabêje. Bi vê rebentiya xwe li hemberî min berxwedanê çêdike.” Lê dîsa Paşa bi dilekî nerm ji şivan re got:

– Şivanê min, rebenê min. Ji paşayê xwe re vê meseleyê bibêje. Bi soz û peyman ezê keça xwe jî bidim te.

Şivan:

– Paşayê min, mezinê min, keça te ji min re nabe. Ez mirovekî şivan im. Êdî tu jî dev ji vê meseleyê berde.

Paşa gelek aciz dibe hew xwe digire. Bi ser şivan de diteqe. Bangî wezîran dîke û dibêje wan:

– Vi belengazî biavêjin zîndanê û lêdaneke giran pê bikin.

Wezîran şivan avêtin zîndanê. Celadan gelekî lêdan bi şivan kirin, da ku meseleyê bibêje. Lê şivan berxwedanê xurt li hemberî wan pêk anî, qet tişteke ji wan re negot.

Piştî demeke dirêj derbas bû, şerêkî giran û mezin di navbera welatê paşa û bi welatekî din re derket holê. Paşa tabûrek leşker amade kir, bi rê kir, ku li hemberî wî welatî din şer bikin. Gava ew tabûr çû cengê, hemû leşker di wî şerî de hatin kuştin. Bes qumandarê tabûrê xilas bûbû. Piştî wî vegeriya welatê xwe, Paşa qet jê nepirsî ku çawa hemû leşker hatin kuştin. Paşa hema tabûra diduyan kir rîya cengê. Ew tabûr jî mîna ya yekemîn tev hatin kuştin. Bes qumandar hatibû xilaskirin. Paşa tabûra sisîyan jî bi rê kir. Ew jî mîna a yekemîn û duyemîn, bes (tenê) qumandar sax xilas bibû. Bi vî awayî Paşa neh tabûr leşker şandibûn cengê. Ji xeynî qumandarên tabûran, yê din hemû hatin kuştin.

Roj bi roj welatê paşa dikeve rewşeke xirab, welatê din jî perçeyekî fireh ji erdê paşa xistin bin destê xwe. Êdî welatê hêdî hêdî ji destê paşa dihere. Ji ber ku welatê din êrîşên dijwar diantîn ser welatê paşê. Paşa jî neh tabûr leşker di vî şerî de winda kirin.

Şivan di zîndanê de bi vî şerî dihese. Dibîne ku welatê tev dihere. Şivan ji notirvanê ber derî re dibêje:

– Gazî wezîrêkî bikin. Notirvan xeberê dide wezîr. Piştî wezîrê, lê moral li ser wezîr nemaye, ji tîrsa. Şivan ji wezîr re got:

– Ji paşa re bibêje bila bîst û çar saetan hikumdariya paşatiyê bide min, ezê welatê din bidim şikandin. Ger min ev yek pêk neanî, bila paşa serê min jê bike.” Wezîr bi lez diçe, xeberê dide paşê û hemû gotinên şivan jê re şirove dike.



Sê cildên Dîroka Kurdistanê

Pirtûkên Nivîskar û Lêkolîner Etem Xemgîn ên lêkolînî yên bi navê "Kurdistan Tarihi (Dîroka Kurdistanê)", ku berê ji hev cuda hatibûn çapkirin, wekî sê cildan ji layê Weşanxaneya Doz ve ji nû ve hatin çapkirin. Di van her sê cildan de, ne tenê li ser dîroka kurdan, li ser şaristaniyên ku di Kurdistanê de jiyane jî yek bi yek hatiye rawestîn.

Di cilda yekemîn de; ji dîroka Kurdistanê ya heyama berî mîladê heta İslamîyetê tê nixandîn. Di pêşka ve cildê de li ser binyada kurdan dîtinên nivîskar û dîrokzanên ereb, tirk, faris û ewrûpî tîrên pêşkêşkirin. Dema mirov li van dîtinên nivîskar û dîrokzanên navborî baş dînihere, mirov dibîne ku, ev tezên li ser gelê kurd ji rê û rêçikên zanistî dîr in û ew kes li gorî berjewendiyên xwe yê nîjadî tevgeriyane. Ewrûpiyan kurd ewrûpî, tirkan tirk, farişan faris, ereban jî ereb hesabandine û li gorî vê yekê tezên ecêb derxistine holê. Bi taybetî dîtinên nivîskarên ereb û tirkan mirov şaş û metel dihêlin û nîjadperestiya wan jî rind derdikeve holê.

Di cilda yekemîn de ligel van yekan, li ser jiyana mirovên seretayî yên di Kurdistanê de tê rawestîn û jiyana wan a civakî, aborî tê ravekirin. Pişt re şaristaniyên ku li Kurdistanê jiyane mîna; Gutî, Lulu, Marî, Kasîti, Elaman, Hurî-Mîttaniyan, Urartu, Kaldaharî, Med, Nairî, Mannerî, Haburî, Kardû, Subarî, Çumua, Kulî û li ser eşîretên kurd yek bi yek tîrên rawestîn û dîrok, çand, huner û



jiyana wan a civakî tê ravekerin. Ji bilî van, piştî dagirkirina İskenderê Mezin rewşa Kurdistanê, bandora bîr û baweriyên olî li ser Kurdistanê û zimanê kurdî, mijarên vê cildê ne.

Cilda duyemîn ji pêvajoya destpêka İslamîyetê heta osmaniyan re û cilda sêyemîn jî, ji heyama dewleta osmanî û dewleta Safewiyan re hatiye veqetandin. Di destpêkê de li ser xurtbûna ola İslamê û ketina wê ya Kurdistanê tê sekinîn. Şerên di navbera erebên musulman û gelên Kurdistanê û di vê pêvajoyê de rûdanên li Kurdistanê tê rawestîn. Di vê cildê de beşa herî mezin dewletên kurdan ên serbixwe digirin, bi awayekî berfireh dîrok, çand, jiyana civakî û tîkiliyên wan dewletên mîna Merwanî, Şedadî, Hamadanî û dewletên cînar de hatiye ravekirin. Ji bilî van yekan, mîrîşînên

di vê heyamê de li Kurdistanê desthilatdarî meşandina di vî cildê de cih digirin.

Cilda sêyemîn bi giştî rewşa Osmaniyan û Safewiyan, bandora dewletên rojavayî li ser Kurdistanê, pîrgirêka ermenî û gelê kurd radixe ber çavan. Di vê heyamê de tişteki balkêş ew e ku edî dewletên kurd ên serbixwe tune. Bêguman di vir de dek û dolabên Osmanî û Safewiyan û nakokiyên di navbera begên kurdan de roleke girîng dileze. Kurdan an bi desthilatdariya Safewiyan an jî bi desthilatdariya Osmaniyan bi mîrîşînên biçûk hikûm meşandine.

Di dawiya vê heyamê de, rewşa Kurdistanê bi giştî û rewşa xwezayî, civakî, aborî, çandî, hunerî û olî yek bi yek tê ravekirin û qala tevgerên neteweyî tê kirin.

SERWISA ÇANDÊ

Salnameya rojê bi demjimêr ya Dozê


Weşanxaneya Dozê ev sê sal in ku "Salnameya roj bi demjimêr" derdixe. Sala pêşîn bi du zaravayên kurdî; kirmanckî û kurmançî, van du salên dawîn jî bi zaravayê kurmançî ev salname tê amadekirin. Ev salname ji bo kurdên ku dixwazin çanda xwe binasin gelekî karîger e. Lewre gelek agahiyên bikêr ên di nava rûpelên vê salnameyê de cih digirin.

Di rûpela pêşîn a her pelê salnameyê de digel mêjûya mîladî, mêjûyên hîcrî, romî û kurdî jî cih digirin. Li bin van mêjûyan katjimarên nimêjê, navê zarokan balê dikişînin. Bûyera girîng a wê rojê jî li ser heman rûpelê ye. Her wekî sala çuyî îsal jî li xwarê di nava çarçoweyê de gotineke pêşyan, di nava çarçoweya li hemberî wê de jî tiştonek cih digire, li bin van jî gotineke kesekî navdar heye. Di rûpela li pişt vê rûpelê de jî, li jor li aliyê rastê di nava çarçoweyê de çarnek ji dîlokeke kurdî û li xwarê li milê çepê jî dîsa di nava çarçoweyê de pêkenokek cih digire. Ji bilî van di vê rûpelê de gelek agahiyên karîger hene.

Doz Basım-Yayın Ltd. Şti.
İlk Belediye Cad.
Vural Arıkan Apt.
Tünel/ İstanbul
Tel/fax: 0212- 245 41 37

Nivîskar

OSMAN ÖZÇELİK



- Tu çi karî dikî?
- Ez nivîskar im
- Ez kêfxweş bûm, ez ji xwendinê zehf hez dikim. Gelo, hûn pirtir ji klasîkan an, ji nûjenan hez dikin?
- Ez hez ji klasîkan dikim. Lê belê ez bi xwe nivîskarekî nûjen û hemdem im.
- Gelo li ser Dostoyewskî, ramanên we çi ne?
- Min bihîstîye ku, ew, romannivîsekî rûs ê klasîk ê herî girîng e.
- Min bihîstîye çi ye? We romanên wî nexwendine?
- Na xêr, min ne xwendine.
- Nihâ hûn dikarin bibêjin, min Tolstoy û Gorkî jî ne xwendine!
- Rast e, min ew jî nexwendine
- Lê Victor Hugo, Stendhall, Şolohov, Hemingway?...
- Na, na xêr.

- Ez ditirsim hûn bibêjin min Yaşar Kemal, Nazim Hikmet, Cegerxwîn û Melayê Cizîrî jî nexwendine!

- Ez ji te re dibêjim: "Ez nivîskar im", tu ji min pîrsa xwendina nivîskar û pirtûkên wan dikî. Heyran ez ne xwendekar im, ez nivîskar im.

Belê, gelek kes hene ku, bêtir xwendina yek pirtûkê û heta bêtir xwendina rûpelek nivîs, radibin nivîsan dinivîsin û ji xwe re dibêjin nivîskar. Nivîskar! Ên wiha, ji vir û wir çend hevokan didizin û tînin ba hev û dibe nivîs: Mirov dikare heta kengî bi nivîsên wiha, yê di tama kundir de, xwendevanan bixapîne?

Hinek nivîskar jî hene ku bi-rastî jî gelekî dixwînin. Ma tenê xwendin jî; tîrî nivîsê dike? Nivîseke qenc, mejiyekî zelal divê, huner divê.

Ku mêjî ne zelal be û bi nivîskar re kompleksa pîrzanîne hebe, nivîskar, di axaftin û nivîsên xwe de, dixwazin bidin xuyan ku, bê wî/wê çiqas pir xwendiyê. Ewqas zehf cih didin nav û gotinên feylezof û nivîskarên bi navûdeng ku mirov nema ji axaftin û nivîsên wan fêhm dike. Bi rastî ji ber ku mejiyê wan ne zelal e, ew jî nizanin bê ka çi dibêjin. Mirovên wisa,

dizanin ku gel ji xwendinê hez nake û naxwîne, rast û nerast çi tê ber devê wan wisa dibêjin û yek caran dikevin rewşeke wilo ku, dibin pêkenokê devê alemê.

Li Hekariyê, Egîd ê eşîra Qeşûran bi nav e. Egîd axa, ji axaftina zanistî hez dike. Lê belê xwendin û perwerdebûna wî ne zêdetirî dibistana seretayî bû. Ji şîretan hez dikir û axaftina xwe bi dîtin û gotinên ecêb dixemiland. Mesela digot: "Profesorê aleman Çorçil dibêjtî 'saqla semanî gelir zemanî' An jî digot: " Alimê mezin ê îngiliz Corc Kenedî dibêjtî ' Damleye damleya gol olîr."

Mirov nizane wê kî derê van gotinan rast bike. Ji serî heta binî tijî çewtî û şaşî ne.

Di nivîsan de dayîna çavkaniyan tişteki exleqî ye. Lê belê ku nivîs ji serî heta binî bi jêderan (alıntı) bê dagirtin jî, ji pêwîstiyê derdikeve, dibe quretî.


Em di destpêka avakirina çanda kurdî ya nivîskî de ne. Mirov bîngehê bi çî awayî deyne, wê wisa here. Pêdiviya me bi quretî û nezaniyê tune. Pêdiviya me, bi zanistî, xebat û lêkolînên kûr heye.

Her mirovên ku dest avêtin pênuşê, divê bi giraniya vî barê berpirsiyariyê bizanibe.

Gur û mî

Dema biharê şivanek pezê xwe dibe dûrî gund diçêrîne. Dibe êvar, şivan pezê xwe dibe gund. Di ser erxê avê re derbas dike. Mîhek jar di ser kendalekî bi herî re nikare derbas bibe, di nava heriyê de li ser kendêl dimîne. Şivan nabîne, pez dihere. Mîh dike mare-mar:

- Hawar medet, min xilas bikin!
Bi deng û gazina mîhê re, gurek dibihîze tê hinda mîhê. Gur ji mîhê sewal dike:
- Tu ji bo çi di vir de mayî?
Mîh:
- Ez di nav heriyê de mame, bi xêra xwe min xilas bike, dibêje. Bi çazûfî li axaftina xwe berdawam dike:
- Birayê gur, ez pîr im, û pîr jar im. Min ji vê çamûrê xilas bike, ez bi biharê bikevim ezê qelew bibim, biçêrim, wê goştê min zêde bibe. Wê çaxê tu bê ber keriyê pez, gazî bike bêje 'islanmiş, islanmiş' ezê ji nava pez veqetim, werim, wê gavê tu jî min bixwe.
Gur dipejirîne, dibêje:
- Baş e, ezê biharê werim. Gur wê ji nav heriyê derdixe, dike bixwe, lê bala xwe didê jar e, tu goşt pê ve tune ye, wê berdidê, diçe.



Dibe bihar. Mîh diçêre û qelew bûye. Gur tê nêzîkî kerî û bangî mîhê dike:

"Islanmiş, islanmiş...
Ev mîha şil, zêfî û jar,
va ye bûye bihar
kanê soz qinyetê te bi min re da-bû?
Mîha qels û jar dengê gur dibihîze û dibêje:
Gurê har!

Ev sal bûne du hezar
Tu ji me re bûyî neyar
Te gelek kar û berxên me xwar
Tu û em bi hev re nabin yar
Em bûne terkî diyar
Bira gedên me nebihîzin
Wê postê te bînin xwar

Li ser vê yekê gur, li wan gund û bajaran dibe terkî diyar.

FÛAD ALTÛN

Axa û eşîra wî

Wexta berê, yekî axa, xwedî eşîr û misilman hebû. Axa rojekê di xewna xwe de dibîne, yekî wekî Xocê Xizir jê re dibêje:

- Îşev wê baranek bibare, lê belê kî ava vê baranê vexwe, ewê dîn bibe.

Û axa bi xwe dihesê, hişyar dibe. Ji bo ku bi aqil û zana bû, berî ku baran bibare li gorî zemanê berê, çi teneke û satil û elb û mexmerên wan hebûn, giş tijî av kirin û baran dibariya. Xelkên wî, mirovên wî û eşîra wî gişan ava baranê vexwar û dîn bû. Axayê wan venexwar û dîn nebû. Li gorî xelkê wî, ew dîn bûbû. Ji hev re digotin;
"Axayê me dîn bûye, ka em dê çi bikin, pê?
Rîsipiyên eşîrê hatin û ji axê re gotin:

- Heyra welleh tu dîn bûyî. Kanî emê te bibin cem şêx û mişayîxan.

- Heyran, qurban ez bîaqilim! ê ku dîn bûne hûn in.

Ew napejirînin û radibin li hev û dîn dicivin. Dest û lingên axê dixin qeydan. Axayê xwe girê didin. Axa bala xwe dide ku wiha nabe. Ji vê ava baranê ku bariyaye, Axa jî vedixwe û ew jî wekî wan dîn dibe. Ew heft roj û heft şevan dawetê digirin. Li def û zurneyê dixin. Çil heb deveyan serjê dikin. Nan û xwarinek zehf û qenc datînin û dua dikin dibêjin:

- Mala rebê me ava be, dîsa axayê me daye me. Û bi hev û dîn pir şad dibin.

SEYDO BAŞÇI

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (102)

XAÇEPIRSA

Serbûnê Nêzîkî	F	N	R	H	N
Neçerî	G	E	G	D	E
Tîpê Nêzîkî	A	R	Z	B	I
Emê Nêzîkî	C	I	N	E	K
Emê Nêzîkî	X	A	M	P	A
Emê Nêzîkî	A	D	I	N	A
Emê Nêzîkî	A	R	S	I	B
Emê Nêzîkî	A	N	A	R	S

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsa 100'î

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 102'yan Keseta Hozan Baran "Çenê Çenê" ye.



Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyan li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîgana xwe ji me re bişînin.


Pênc kesên ku xelata hejmarê 100'î Salnameya Özgür Halkê ya 98'an qezex kirine: Felat Kaya/Stenbol, Medeni Alpkaya/Amed, Büro Omerî/Mêrsîn, Ahmet Taşer/Qeyserî, Murat Kaya/Semsûr

Lêborîn: Di xaçepirsa heftêya borî de pirsê kesê di wêne de bi xelati 'şehîdek' derketiye, rastiya wê 'nivîskarek' e.

Nebatiyek ... Özbek (Şehîdek)	Enî Tixûb	Zîrek Nivdengde rek	Tipek Bî kirdkî qertafa neyînî	Hucra Paytextek	Dixin destê xwe
			6		
		5		Hevraz Pîrêz	
Dixin stûyê ga	8	Xerib Di muzikê de dengê mêran			
Blyanî					
			Meçêtr (Berepaşki) Gelekî Kurdistanê		1
Dengêrê n 'Şino'		Îstîqrar			Dawera fyotê
Dawera potasyûmê		Xanî (Berepaşki)	2		Gihanekek
3	Goreyê... Di muzikê de dengê jînan		Dawera kukurtê Tipek	Çarşi Sewalek	
Dawera argonê	Dawera hidrojenê Nexweşiyê k		Çekek şer Bîn...		
Sixur				Tav Dawera helyûmê	4
Mehtap					
Baneşane k					
		Xwedê nenasî		Tipeke kurdî	



PEYVA VEŞARÎ



Tc û Israîl tetbîqeta hevpar ya behrê çêkirin




Dewleta tirk fina kişt

Dewleta tirka zindananê xo de esîranê şerî jew bi jew kişena û na polikaya wa dî-roka ci de her fin babetna vejyena werte. Heveyê esîran çiwana, qelasa, grewê veşanîn de û heveyan jî nêweşîn ra kişena. Goreyê qanûnanê şerî, êkê şeran de esîr kewnê, benê meymanî û nînan rê jî muameleyê meymanîn beno. La belê dewleta tirk de zey kerdenanê binan, nê kerdenande jî wina nêbeno. Dewleta tirka senîke esîrê şerî kewnê ci dest, hema wazena înan bikşo û heyfê vinîkerdîne şerî, esîranê şerî ra bigiro. Rastî, nê kerdenî hend vêşî yê ke, ne nûstena qedyenê ne jî rîperê rojnamey nînan rê qîm kenê.

Pancê na meng de esîra PKK'yi Serpil Yılmaz çosmeyê nê politakanê dewleta tirk de Nêweşxaneyê Şişli de, emeliyatê mezgî biyin de şehîd kewt. Esîra PKK'yi Yılmaz, 2 mengî yo Girotxaneyê Sakarya de raya nê operasyonî pawitê. La belê wexto ke, a ard Nêweşxane teqet (kûwet) ra kewtibî, ancî wija çehar rojî xo ver da.

Serpil Yılmaz, hetê DGM'ya Stenbolî ra, goreyê qanûnê tirkan ê 125'in, cezayê idamî girotîbî. Mahkema bahdo, no ceza vurna muebetî. La belê dawa ci na hewna mahkeme cor de (yargitay) pawena. Nezdîyê deş-pançês rojî verî, nêweşîna ay bî vêşî û xo ra ravêrd.

Wexto ke sînor de tepîşyêbî jî nêweş bî û waştî ke qandê tedawiya xo şira Ewrûpa. Sifte Edirne de, bahdo jî Stenbol de binçim de zaf îşkence û tahde dî. Nêweşîn û îşkence ra ganê ci quwet ra kewt bi. Weşîna zîndanî jî kok ra, tahdewo gird dabi ci. Zindan de finê ra pay ra kewna û paykewtina embazanê ci sero, dewlet ay benê nêweşxane. Roja sersal de doxtorî mejege ci ra dest bî operasyon kenê. Panc rojî tepya, fina, mejege ay ra gonî yena. Operasyona didin de, no



fin weşîna xo dest ra dana. Goreyê doxtoran namê nêweşîna mejege ci, anewrîzma bî. Na nêweşîn ra mejege de, gonî zey balonan arêbiyena pêser. Serpil Yılmaz, wexto ke weşîna xo vinî kena; malbata ci sermiyanê HADEP, malbatê TUHAD-DER û welatperwerî yenê nêweşxane.

Şarî qandê Serpil Yılmazî, nêweşxanî ver de jew komekeka hera viraşt û ebi zilgitana meytê ci riştî Kurdistan ke, şarîstanê Ardîhanî de dewa Bêşiktaş de bitepriyo (bidê her). Morga nêweşxanî ver de rojnamegeran rê, serokê TUHAD-DER'î Halîs Doganî dazanayin viraşt û wina vat: "Nêverdayî ke Serpil tedawî bivîna, cok ra a şehîd kewt. Embaza Serpil, ne şehîda ma ya sifteyin a û ne jî a peynî ya. Ma şehîdanê xo heminan jî, anê xo vîr û rûmetê înan ra zerî genê." Sekreterê partiya HADEP a Stenbol

Halil Salîkî jî, daznayin de sifto şerê limînî sero vînayînên xo ardî zîwan û pey ra jî wina vat: "Dewlet wexto ke nêşena fikranê ma esîr bigîro, ebi nê politîqana wazena ma jew bi jew bikîşo. La belê peyniya nê politîkanan çiniya, nê xeftiyayînê winayînî gurwe wo neheq o." Salîkî pey ra maya Serpil, Pamuk û piyê ci Musa Yılmazî jî, fikrên xo wina ardî zîwan: "Keyna ma Serpil weşîna, ebi rûmeta şehîd kewt. Mayê ay ra, tim û tim rûmet bigîrê. A ya zerya ma ra, qet nêweşyena." Şarî peyniya nê dazanayinan de meytê Serpil Yılmazî, slogan û zilgitana riştî welat.

Eren Keskin: Mayê gery bemi dadgeha Ewrûpa

Awûqata Yılmaz, Eren Keskinî da zanayina xo de, vînayînên doxtoran ard zîwan û pey ra jî wina vat: "Mi ebi doxtoran ra qisey kerd. Doxtoran vat, nêweşa anewrîzma rê eke rew operasyon nêbo, weşîna nê-

weş kewna risk. Eke wextê tedawiyê ci nêravêrdê, şansê Yılmazî kiştê weşîn ra estbî. Mayê di heftê tepya, raporê merdinê ci bigîrê. Goreyê nê raporî jî mayê dewleta tirk gere bikrî. Goreyê mehkemeya Ewrûpa heqê esîran esto ke, dewlet nêweşîna înan weşkiro. La belê na dewlet, qandê merdina Serpil Yılmazî çiçî ke ci dest ra amewo kemî nêkerdo. Weş aysiyeno ke erbetê na dewlet, merdina Yılmazî de saf gird o. Ma qanûnanê na dewlet ra çiyê nêpawenê, la belê iyê Ewrûpa de verpirsê (cewab) ma bidê."

Meyitê Serpil Yılmazî, hewtê menga rêbendan de, dewa Bêşiktaş de şarî da her. Dew de zaf merdimî ameyê pêser û ebi sloganê "Şehîd Namirin!" a daya hera Kurdistan.

MABENDÊ VENGÛVAZAN

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNİŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerîndeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
REFİK İNCİR

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewrûpayê)

Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helîm Yûsiv

Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selîm Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robîn Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

Ji

Gündemê

3 rêbendan 1998 Şemî:

NÎVÊ NIFÛSÊ DI ASTA SEFALETÊ DE YE

Li gorî lêkolînên Înstîtuya İstatîstîkê ya Dewletê (DİE) hate tesbîtkirin ku beşeke mezin ji nifûsa ku li Tirkîyeyê dijî nikare nên jî bi dest bixe. Li gorî heman agahiyê, di navbera malbatên herî belengaz û herî dewlemend de 12 hezar qat ferq heye. Dîsa li gorî vê lêkolînê asta belengaziyê di navbera bajêr û çolteran de her ku diçe mezintir dibe û kesên ku li bajarên Kurdistanê rûdinin, ji ber ku nesîbê xwe ji şerê qîrêjî bi awayekî giran distînin ên herî feqîr in. İstatîstîkên DİE'yê destnîşan dikin ku Tirkîye bi vê rewşa xerab di nav dewletên cihanê de, di warê bêdadiya parvebûna dahatûyê li mirovan, di rêzên pêşin de cih digire.

4 rêbendan 1998 Yekşem:

MIRIN GAV BI GAV NÊZİK DIBE

Hate ragihandin ku li Girtîgeha Erziromê greva birçîbûnê ketiye roja xwe ya 46'an û rewşa 19 girtiyan her ku diçe xerab dibe. Kibar Kara û Hîrak Ekinci ku malbatên Girtiyan Erziromê ne, ji bo çareseriyek pêk were kar û barê xwe yê li Enqereyê didominin. Kara û Ekinci dadixuyînin ku ewê bi Mîdûrê Girtîgehê Hüseyin Turgut re hevdiştinan pêk binin û heger çareseriyek pêk neyê ewê xwe li ber deriyê wezaretê dadê bişewitînin. Her wiha malbatên girtiyan li ÎHD'ya Edeneyê daxuyaniyê çapemeniyê li dar xistin û gotin ku rewş roj bi roj ber bi mirinê ve diçe.

5 rêbendan 1998 Duşem:

TIRKIYE DI QEYRANA DİPLOMATİK DE YE

Penaberên kurd ku bi keştiyan xwe gihandibûn İtalyayê li nav raya giştî ya Rojhilata Navîn, Tirkîye û Ewropayê dengê mezîna veda. Serokwezîrê İtalî li hemberî rewşa penaberan daxuyand ku ew nikarin ji bin vî barî derkevin û ji Yekitiya Ewropayê alîkarî xwest. Wezîrê Karê Derve yê Almaniyayê

Klaus Kinkel ji bo vê rewşê pêwîstiya çareseriyê siyasî anî zîman. Her wiha Wezîrê Karê Derve yê Tirkîyeyê İsmail Cem ji İtalyayê xwest ku mafê penaberiyê nedin kurdan. Li hêla din PKDW banga hevkarîyê li hikûmeta İtalî kir û daxuyand ku ew heta dawiyê ji bo penaberên kurd bi İtalyayê re ne.

6 rêbendan 1998 Sêşem:

HÊZÊN DEWLETÊ AVÊTIN SER HADEP'A WANÊ

Roja 5'ê rêbandana 1998'an HADEP'a Wanê ji hêla hêzên dewletê ve hate dagirkirin. Di lêgerîna partiyê de rojnameya Azadiya Welat, kovara Özgür Halk û pirtûkên İsmail Beşikçi hatin desteserkirin û Serokê partiyê Abdurrahman

sînor hatibû kuştin. Navê kuştîyê din diyar nebû. Waliyê Rihayê Şahabettîn Harput îdia kir ku kesên hatine kuştin bi leşkeran re ketine şer û vî şerî jî 2 saetan dom kiriye. Wekî tê zanîn di 20'ê berfanbara 1997'an de jî 5 gundiyan kaçaçî ji hêla hêzên dewletê ve hatibûn kuştin, piştî re jî îdia kiribûn ku ew PKK'yî ne.

8 rêbendan 1998 Pêncşem:

TIRKIYE LI PEY DEWLETA TIRKMANAN E

Tirkîye bi operasyonên xwe yê dagirkirinê, ji bo ku başûrê Kurdistanê ji mirovên kurd paqij bike, dest diavêje her hacetî. Hate ragihandin ku ji bo dewleta tirk li



Doğar û sekreterê partiyê Faris Bozaran hatin binçavkirin. Her wiha hate ragihandin ku polîsan li partiyê kişandina kamerayê û ji ber ku çarta rojnemevanîyê pê re tunebûye nûnerê rojnameya Ülkede Gündemê Adil Harmancı jî binçav kirine.

7 rêbendan 1998 Çarşem:

LI SER SÎNOR DU KESÊN DIN HATIN KUŞTIN

Du kaçaçiyên ku dixwestin ji navçeya Akçakale ya Rihayê derbasî binxexê bibin ji hêla leşkerên tirk ve hatin kuştin. Hate ragihandin ku navê kaçaçiyekî ku hatiye kuştin İsa Çotanak e û mirovê Mehmet Çotanak e ku ew jî li ser

Başûr bi daxwaz û fermana Amerîkayê li Rojhilata Navîn dewleteke tirkmenan ava bike dest bi keft û leftan-kiriye û rewşa penaberên kurd ku di van rojên dawî de ketiye rojeva cihanê, bi vê yekê ve tê girêdayîn. Li gorî agahiyên bi dest ketine subayên tirk ên li herêmê ji bo ku kurdan wekî tirk nîşan bidin, xebatê dikin.

Der barê vê mijarê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di dawîya meha rezberê de daxuyandibû ku dewleta tirk li başûrê Kurdistanê li dijî gelê kurd û tevgera PKK'ê dixwaze dewleteke tirkmenan ava bike. PDK jî ji ber têkiliyên xwe yê bi dewleta tirk re çavên xwe ji vê yekê re digire.

Nirxandina hefteyê

Dema mirov bala xwe dide nûçeyên ku di manşeta rojnameya Ülkede Gündem de cih girtine, sedema qedexeya li ser rojnameyê jî bi awayekî zelal û diyar derdikeve holê. Lewre dîmena hefteyê ya dewleta tirk destnîşan dike ku ew ji her alî ve li ber têkçûnê ye.

Ji aliyê aborî ve li gorî îstatîstîkên saziya dewletê xizani û bêdadî heye. Li girtîgehan ji ber zilm û zora berpîrsên girtîgehan girtiyan azadiyê li ber xwe didin, grevên birçîbûnê gihîştine rojên 50'yî, dayikên girtiyan qala xwe şewitandinê dikin, lê berpîrsên faşîst ên girtîgehanê jî girtiyan wekî dijmin bi nav dikin. Bi hezaran mirov ji ber xizani û zilma dewletê ji êrdima di bin destê ve dewletê de direvin. Ev yek jî dibe sedema qeyrana dîplomatîk, lewre ewrûpî ji bo ku rê li ber hatina penaberan bê girtin çareseriyê kêşeya kurd dixwazin.

Lê dewleta tirk guh nade van daxwazan û ji bo ku rastiye veşêre li pey dek û dolaban e. Polîsên tirk bê paxav diavêjin ser avahiyên partî û sazîyên demokratîk. Bo nimûne ve hefteyê jî avêtin ser HADEP'a Wanê, rayedarên partiyê girtine bin çav. Li başûrê Kurdistanê jî bi hezaran leşkerên tirk, êrîşî ser hêzên azadixwaz dikin, bi vê jî namînin, dixwazin kêşeya kurd ji binî ve ji holê rakin, başûrê Kurdistanê bikin warê tirkmenan, dewleteke tirkmenan ava bikin.

Polîtîkaya dewleta tirk ji du peyvyan pêk tê; xapandin û tepeserkirin. Yanê heta ku karibe wê rastiye veşêre, gel bixapîne, dema nikaribe rastiye veşêre îcar wê bi zilm û zorê dengê dijber bibire.

Ji ber vê yekê hêzên dewletê dijminatiya rojnamegeran dikin, êrîşan dibin ser antenên peykan. Êdî gelê kurd nayê xapandin, nexwe divê dengê wan bê birin. Lê hewlên bi vî rengî tu caran bi ser neketine û tevî xwediyê xwe li ser tînga dîrokê cihêkî "bêpayan" girtine.